



Danerê Rojnameya pêşî ya Kurdi Miqdad Mûhed Bedirxan

Armanac

Hejmar, No: 156
Çileyê Paşîn
January 1995
Buha - Price
20 SKR, 4 DM

Rojnameya Mehane

Xebata Cephêya Bakur bi ser neket

Ji bo karê bi hev re divê bawerî bi hev bête anîn û berjewendiyên gelê Kurd li pêş her tiştî bête girtin. Sedema esasî ya bela-welayîyê hesabên biçûk in ku tu girêdana wan bi rastî û berjewendiyê gelê me tune.

Platforma avakirina bereyê netewî yê demokratîk li Kurdistana Bakur ku di hezîrana 1993'an de dest bi guftûgoyan kiribû, negihaşt tu netîceyekê û belav bû. Li gor daxuyaniya 12 grûb, rêxistin û partiyên Kurdistana Bakur (YEKBÛN, PDK-Bakur, PSK, PKK, KUK, KAWA, TSK, PÎK, PRK-Rizgarî, PRNK, Têkoşîna Sosyalîst, KKP) ku di dawîya çileyê paşîn de hatiye belavkirin de weha têtê gotin: "Her çiqas bîr û rayên cuda di navbera rêxistinên me de hebûn jî, me di gelek warî de dîtînen mûsterek pêk anîbûn lê mixabin di meseleya bereyî de me li hev nekir. Sedem jî ew bû ku dîtînen me yê li ser awayê bereyî jî hev cuda bûn û baweriyê xurt di navbera me de pêk nehatibû. Ji ber vê yekê jî karê avakirina bereyî sekinî û tu gav nehatin avêtin. Her çiqas rewş îro weha be jî rêxistinên me di wê baweriyê de ne ku divê pêvajoya danûstandinê her berdewam be. Ji ber vê yekê jî rêxistinên me biryar dan ku pêvajoyaku di 17'ê Hezîrana 1993'an

de dest pê kiribû dê her berdewam be."

Wek têtê zanîn pîrsa avakirina bereyê netewî û demokratîk piştî agirbestina PKK'ê ya yek alî bi carekê de û zûka hatibû holê. Gelek kes û rêxistin bi germî lê ve pêvajoya nû dinêrin, li hin jî bi şik bûn ku di demeke kurt de ev hêz bikaribin bi hev re bereyêkî ava bikin.

Her weha her çiqas ev platform hatibû avakirin jî di pratîkê de van hêzan nikaribûn tu karê mûsterek bi hev re bikin. Ji xwe jî bo PKK'ê dema bihata hesaba wan platform hebû yan na tunebû.

Beriya vê belavoka bisernekîne vê platformê di 9'ê nîsana 1994'an de di daxuyaniyê xwe de weha digot: "Rêxistinên me ku avakirina bereyê netewî şertekî esasî yê serkeftinê dibînin, careke din didine zanîn ku ji bo avakirina bereyî hemû bîr û baweriyê xwe diparêzin."

Lê belê piştî deh meh ji ser vê daxuyaniyê derbas dibin platform



Xebata cepheyê bi meş û mitîngên hevbeş dest pê kiribû

Foto: Armanac

tête belavkirin.

Ma gelo bela-welayî çarenivîsa gelê me ye?

Bi gotin û nivîsandinê hemû alî bereyî weka dezgehê serkeftinê dibînin lê ev yek bi salan e pêk nayê. Helbet avabûna bereyî tenê

bi serê xwe jî ne çare ye. Tecrûbeya Kurdistana Başûr li ber çavan e. Her çiqas bereyê Kurdistanê heye jî cardin jî herdu aliyên serreke yê di vî bereyî de PDK û YNK bi hev re bawer in, di navbera wan de reqabeta desthilatda-

riyê heye, ji ber vê yekê jî ew nexweşiya reqabê ku bi salan e her berdewam e, careke din bû bi serê Kurdujîyê.

Ji bo karê bi hev re divê bawerî bi hev bête anîn û berjewendiyên gelê Kurd li pêş her tiştî bête girtin. Sedema esasî ya bela-welayîyê hesabên biçûk in ku tu girêdana wan bi rastî û berjewendiyê gelê me tune.

Endamê Komîteya Rêvebir yê YEKBÛNê Sîdar Eren:

"Em cepheyê fonksiyoner dixwazin"

rûpel: 5

Yaşar Kemal:

"Komara Tirkiyeyê sistemeke zilm û barbariyê ava kiriye"

Romannivîskar Yaşar Kemal li hember zilma dewleta Tirkiyeyê qîriya û di kovara Almanî "Der Spiegel"ê de, rewşa gelê Kurd, bi nivîsa ku navê wê: "Sefera Derewan" e, anî zimên. Nivîsa Yaşar Kemal hem li welêt û hem li Tirkiyeyê baleke mezin kişand. Li ser vê nivîsê, munaqeseyên cur be cur hatin kirin. Berpirsiyaran dewletê û nemaze jî medya û pênûsên di emrê Konseyê Ewleyî ya Dewletê de êrişên dijwar birin ser vî nivîskarê ku bi eslê xwe Kurd e. Dadgehên Tirkiyeyê yê bîdada jî dest bi vekirina daweyan kirin û xwestin çavên Yaşar Kemal bi hefsê bitirsînin. Lê yê ku digotin, qey çavên nivîskarê mezin dê bi van êrişan bîr tirsandin, bi tenê xwe xapandin. Yaşar Kemal li hember bûyerên piştî weşana "Der Spiegel"ê û nemaze jî li hember dawewekirîne, helwesteke mîrxas û bi şûr wergirt. Li gor agahdariyên ku wî di vî warî de da rojnameyan; Daweyê venekin, dê ji wan re baştir be. Ger vekin, ne ez, lê ew ê bîr mehkemekirin."

"Sefera Derewan" jî ber navdariya Yaşar Kemal ya di warê navneteweyî de, di demeke kin de, bala raya giştî ya dinyayê jî kişand û di gelek rojnameyên welatên Ewropayê de, bû sebebê nivîsandina gotar û munaqeseyên cuda. Rojnameyên hinek welatan beşin jî vê nivîsê wergerandin zimanên xwe û weşandin.

Yaşar Kemal di hejmarê "Der Spiegel"ê ya duyem ku di 9'ê Çileyê Paşîn de hat weşandin de, weha dest bi nivîsa xwe ya "Sefera Derewan" dîke; "Komara Tirkiyeyê jî damezrandina xwe û heta nuha, sistemeke zilm û barbariyê ku nayê tehamulkirin, ava kiriye."


Di nivîsê de durûtiya Tirkiyeyê ya di warê veşartina zilmê de têtê zimên û tehamuliyê gelên Tirkiyeyê ya li hember vê zilmê, tiştêkî mucîze têtê dîtînen. Yaşar Kemal di "Sefera Derewan" de li ser derbasbûna sistema pîrpartîtiyê jî radiweste û nedemokratîbûna "Partiya Demokrat" ya ku serokê wê Adnan Menderesê ku bi derbeyeke leşkerî hate dardakirin,

tîne zimên.

Pênûsa Y. Kemal carekê dest bi reşkirina kaxezê kir, êdî rawestî lê tune, her diçe xurttir dibe û zilmê bi awakî mîrxasî dinivîsîne.

"Nuha li Tirkiyeyê, şerrekî we ha namerd heye ku hêza nivîskarê herî mezin jî tîra îzahkirinê nake.

Komara Tirkiyeyê jî bo fetisandina berxwedanê "Sistema Parêzgerên Gundan" ava kir. Ev tetbîqata ku ji hêzên mîlîsan ve pêk têtê, ji aliyê ordiya DYA'yê li Vietnamê hatibû ceribandî. Ji pa-



Peyva Yaşar Kemal dewletê tirsand.

Dûmahîk: r.11

Dr. Abdulbasit Seyda:

"Çiroka Kurdî ya gelêrî qehremanî, merdbûn, dilpakî û destpakiyê berz dîke"

rûpel: 6-7

Zinarê Xamo

"Divê meriv zikir û îbadeta hezar salî bi kaseyê şerab nede"

rûpel: 4

Rêving Hirûrî

"Bes e birakujî"

rûpel: 3

"Tiralên bin darên xurman"

Rojeva Mehê

Mûrad Ciwan

Peyva jorîn di nav civakê Kurd de ji bo kesên keslan û dixwernedîtî tê gotin. Kesên weha di xwe re nabînin ku rabin ji bo jiyana xwe havilekê bikin, derdekî xwe çareser bikin an riyekê li ber xwe vekin. Her gav li hêviya hinên din in ku ew werin derdê wan çareser bikin an riyekê li ber wan vekin. Xelkê, kesê weha bi navê "tiralê bin dara xurmê" bi nav kiriyê. Yanê wê biçê li bin dara xurmê xwe dirêj ke bêtî ku tu tiştêkî din bike, li hêviyê be ku xurme bi xwe ji darê bibe û têkeve devê wî.

Tirk jî halê kesên weha bi yekê tînin zimên: "armut piş, ağzıma düş" yanê hurmiyê bigihê û bikeve devê min.

Vî çendê hanê hin tişt diqewimin ku wê gotinê tînin bîra meriv.

Em Kurd, ku nezan in ev me'lûmê her kesî ye, em hemû qebûl dikin. Çimkî em radibin rûdinên dibêjin "Kurd miletekî nezan e." Lê ez dibêjim qey, Kurd ne ku her tenê nezan, her weha tembel in jî. Têkiliyek di navbera nezanî û tembeliyê de heye, lê ez bi xwe nizanîm çî ye bi çî awayî ye. Gelo tîkiliya sedem û encamiyê ye, heke welê be encama vê yekê dibe çî, di van xalan de ji sedî sed ne zelal im. Loma jî neşêm bizzebit tiştêkî bêjim. Lê ya ku ez li serê îkna me ew e ku van herdu gotinan tê-

kilî bi hev û din re hene û herdu xusûsiyet di me Kurdan de bicî ne.

Tê bîra min, berî salên 80'yî û piştî wê jî heta ku sistema sosyalîst hilweşiya û welatên sosyalîst dev ji sistemên xwe berdan

"Em Kurd, ku nezan in ev me'lûmê her kesî ye, em hemû qebûl dikin. Çimkî em radibin rûdinên dibêjin "Kurd miletekî nezan e." Lê ez dibêjim qey, Kurd ne ku her tenê nezan e her weha tembel e jî."

em ronakbîr, siyasî û hêzên siyasî yên Kurdan em dabeşkirî bûn, hin "Sovyetçî" hin "Maoîst û sê dinyayî" hin "Arnawudî" û hin jî "bê teref" bûn, lê me hemiyar edebiyateke siyasî hebû ku qalibek bû, me ji devê xelkê girtibû û bi navê îdeoloji, felsefe û navnetewetiyê me her ew qalibên hazir dicûtin:

"Dinya du kamp e, li aliyekî di bin serokatiya Emperyalizma Amerîkayê de dinya sermiyandârî, li aliyê din di bin serokatiya Yekîtiya Sovyetan de welatên sosyalîst û... û... " yan jî "Fikrên serok Mao, ... sê dinya... Emperyalizma sosyal a Sovyetî... hwd." Belkî jî weha: "Emperyalizma Amerîkayê, Emperyalizma sosyal a Sovyetî,

Rewîzyonîzm û hegemonîzma Çînê..."

Îro dinya gelek guheriyê. Pêre nivîsîn û axaftinên me siyasî û ronakbîran jî hatine guhertin. Lê ya balkêş ew e ku axaftin û qalibên ku em dibêjin carek din wekî

wê dema berê, ne yên me ne, hinekên din hazir kirine, hema yên hazirkirî "lep lûp" em dadî-qurtînin. Me muhaweke nîne ku em lê bigerin, lê bikolin û berhemên li gorî xwe biafirînin.

Nizanim ji bo çî, lê îhtimal e ji ber wê yekê ku rewşa Tirkîyê ya gelekî xerab ez bêhêvî kirime, ji ber wê, ku li Tirkîyê çî li nav Kurdan, çî jî li nav Tirkan ber bi azadî û guherînê serbestî û pêşveçûnê pelekî darê jî bileqe heyecanek mezin dide min, bala min dikişîne û ez dixwazim bizanibim ka ev çî ye, çî dixwaze, wê heta ku here û hwd.

Çendekî berê gava behsa civîna Platforma Demokratîk a Kurdan bû wê heyecanê ez girtim. Ji mêj ve (ev e çend sal in) bû ku behsa

wê dihate kirin. Geh wekî hîva binê ewrê di raya giştî de diyar dibû geh jî dengê wê dibiliya û pêjna wê nedihat. Lê mirov texmîn dikir ku her û her di muhaweleyekê de ye. Dawiya dawiyê gava bi civînekê xwe diyar kir û bîr û baweriyên xwe bi "deklarasyonê" pêşkêş kir bi heycaneke mezin min xwest ez vê teşebusê nasbikim. Muhawela pêşî ew bû ku min deklarasyona wan bi dest xist û xwend.

Lê çî bêjim, gava min xwend hema ew tiralî û ezberçîtiya salên me yên 80'yî hat bîra min.

Erê gotinên ku tê de, gotinên nuh bûn, ne yên dema me bûn. Lê uslûb, uslûba kevî bû, ji dêvla ku ew bixwe muhaweleyekê bikin, tiştêkî berbiçav û taybet bo Kurdan derînin holê, wekî me yê berê rêzkiribûn.

"Dinya bûye yek perçe, piçûk bûye, dinya kureyî, pîrsên global, piyaseya serbest û hwd." Li vir divê ez tiştêkî zelal bikim, ez ne li hemberê wê yekê me ku ew çima xwedî li van fikran derdikevin. Na, heta gelekên wan ez bixwe jî baweriyê pê tînim. Qesda min ew e ku çima em hinde keslanî û dixwernedîtîyê dikin ku bi xwe, ji bo xwe, li gorî rewşa xwe tu fikr û projeyekê demaxin meydane, ku esera orijînal a me be. Me ji der û dorê çî bihistiye, hema em liqata peyvên wan dikin

û dixin tûrikê xwe û pêşkêşî raya xwe ya giştî dikin. Ya ku ez pê qehr dibim a ev tembelî û tiraliya me ye.

Heta hinde bi nezanî em vê yekê dikin ku em haştîyên fahş jî dikin û me hay jî jê nabe. Mîsalek ji deklarasyona PDK'ê. Îfadeyek tê de heye ku dibêje "kuresel dînyanın..." yanê "dînya kureyî". Xwuya ye wan gelek caran bihistine ku terefdarên fikrên nuh behsa "kureyî" yanê "global"î û "dînya" yê dikin, gelek caran van herdu gotinan bi hev re jî bikar tînin, lê ji tembeliya xwe baş bala xwe nedanê ku bi çî awayî û di çî halan de ev peyv tînin bikaranîn û bi çî awayî tînin nik hev. Loma jî bi awayekî ucûbî ev herdu gotin anîne cem hev û nivîsîne "kuresel dînyanın..." Ma dinyayeke ku ne "kuresel" be, "kubîk" yan jî "sîlîndîrîk" be jî heye?

Tê dîtin ku tembelî mirovî dixê çî halî.

De îca tembeliya me ji çî tê? Gelo ji nezaniyê tê? Belkî. Lê bi min ev îzah ne bes e. Heke welê be em pûç bûn çûn: Tembelî ji nezaniyê tê. Tembelî nikare aferîder be. Zanayî û aferîderî wekî mîsala hêk û mirîşkê ye. Nexwe em ê ne zanayîyê ne jî aferîderiyê bibînin.

Na na, ev nezerî ye û ev encam ne rast e.

Li Qamişloyê bîranîna sêsed salîya Mem û Zîn û Ehmedê Xanî

Di 27. 01. 1995'an de li bajarê Qamişloyê ji alî Komîteya Bîranîna Mîrê Helbesta Kurdî M. Ehmedê Xanî" sêsed saliya nivîsîna Mem û Zînê hat pîrozkirin. Vê komîtê ji gelek dem û dezgeh û şexsiyetên Kurdan re derheqê vê pîrozkirinê de beyanek jî bi rê kiribûn ku bi kurtî di beyana xwe de weha dibêjin:

"Em nivîskar, helbestvan, hunermend û folklorîstên Kurd li Sûriyê pêşniyara M. Emin Bozarşan di warê vejandîna bîranîna 300 saliya "Mem û Zîn" a mîrê helbesta Kurdî M. Ehmedê Xanî, dipejirînin û piştgiyariya wî dikin.

Bo vê yekê, di sala 1995'an de, emê festîvalan, semîneran, şevbuhêrkên wêjeyî û çandeyî û şahiyên li dar dixinin. Û ji bo pêşvebirîna van kar û baran me komîteyêke bi navê "Bîranîna mîrê helbesta Kurdî M. Ehmedê Xanî" damezirandiye.

Em hevparî û beşdariya nûnerên rewşenbîr, ronakbîr, kovar, rojname û enstîtut û komeleyên Kurdî li derveyî welêt hêvîdar in û cih jî hebûna berhemên wan re, di programa komîtêyê de dibînin. Herweha jî beşdarî me kêfxweş û şa dîke".

Li Şamê jî bi navê "Komika Ehmedê Xanî" komîtêyek hatîye avakirin. Komîtê bi munaseta 300 saliya Mem û Zînê musabeqeyek vekiriyê.

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê

Gelek nivîskarên Kurd ên ku li Swêdê dimînin, piştî çend civînan munaqeseyan di 22'ê Çileyay Paşin de Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê damezirandin.

Komeleya Nivîskarên Kurd ji bo sekinandina şerê navxwe yê Kurdistanê Başûr û ji bo protestokirina neheqîya ku nivîskar Yaşar Kemal dibin, du daxwuyanî belav kirin.

Komeleya Nivîskarên Kurd di civîna xwe ya yekem de kar di nav xwe de belav kir. M. Malmîsanîj wek serokê Komeleyê, Nedim Dağdevîren wek sekreter û Ahmed Cantekîn jî wek berpirsê aborî hatin hilbijartin. Munzur Çem, Nacî Kutlay, Osman Aytar û Mahmûd Lewendî jî wek endamên Komîteya rêvebir hatin hilbijartin.

Kongreya Duyem ya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê çêbû

"Heta havînê vatiniya Kurdên Ewrûpayê qelskirina turîzma Tirkîyê ye"

Rêxistina Ewrûpa ya Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê di nav meha Çileyay Paşin de Kongreya xwe ya Duyem civand. Kongreyê li ser raporên xebatê munaqesê kir, ji bo du salên pêş programa xebatê amade kir, hin biryaran girt û destûreke taybetî jî bo rêxistina Ewrûpa amade kir. Komîteya Ewrûpayê li ser encamên Kongreya Duyem ya rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê beyanekê derxist.

Di kongreyê de rewşa siyasî ya xerab a Kurdistanê ku îro tede dijî hatîye tespît kirin, li hember êrişên dewleta Tirk yê dirindane bêhelwestmayîna Ewrûpiyan û bêdengmayîna civata Kurd li Ewrûpa rawestîya ye. Di beyana Komîteya Ewrûpayê ya li ser kongreyê de weha tê gotin:

"Kongreya Rêxistina Ewrûpayê li hember van kiryarên dewleta Tirk û bêpaxafiya Ewrûpayê, bê-

deng mayîna civata Kurd ya li Ewrûpayê kêmasiyek mezin dibîne. Herçiqas di vî warî de hin deng bilind dibin jî, ji ber perçeperçe ne û armanc û uslûba wan ne bi îsabet in, encamekê bi dest naxin. Kongreya rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê bangî hemû rêxistin, komeleyên demokratîk, însiyatîfên civakî dîke ku li ser esasê berjewendiyên gelê Kurd, tevgerên acil û hevbeş li hember dewleta Tirk bikin; raya giştî ya Ewrûpayê rakin ser piya."

Yek ji biryarên Kongreyê vekirina kampanyeye xurt li hember turîzma Tirkîyeyê ye:

"Em civata Kurd li Ewrûpayê di wê hêzê de ne ku bi awayên cûr bi cûr yê informasyonê tesîreke mezin li Ewrûpiyan bikin ku ew neçin Tirkîyeyê. Sala çûyî me Kurdên li Ewrûpayê îspat kir ku em dikarin yek ji çavkaniyên aboriya Tirkîyê, turîzmê qels bikin.

Em îsal ji par xurtîr dikarin vê kampanyayê bimeşînin. Heta havînê divê karê sereke yê her ferdekî civata Kurd li Ewrûpayê, protestokirina turîzma Tirkîyeyê be."

Kongreya Duyem ya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê biryara xwe ya Kongreya Yekem dubare kiriyê ku bi her awayî wê bixebite li her welatên Ewrûpayê federasyonên komeleyên demokratîk yê Kurdan bîn avakirin.

Kongreya YEKBÛN'ê li ser pîrsên ciwanên Kurd li Ewrûpayê jî rawestiyaye:

"Li Ewrûpayê hejmareke mezin a ciwanên Kurd heye. Kongreya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê di xaleke programa xebata xwe de, da diyarkirin ku wê bi propoganda û tîkiliyên xwe ve bibe piştgir ku ciwanên Kurd bixwînin û xwendina bilind bikin."

Armanç

Rojname Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine

Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgîn, Mîrza Bextiyar, Lewendî Firat, S. Rêving, M. Lewendî, N. Elî

Redaktorê berpirsîyar: M. Elî, Berpirsîyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj,

Berpirsîyarê rûpelên edebî: Ehmed Huseynî

Utges av: Kurdîska Demokratîska Arbetarunionen

Aboneti/Prenumeration: Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450

SKR, Li Ewrûpa: 60 DM. Li derveyî Ewrûpa: 50 \$,

Anons/ilan: niv rûpel/en halvîdan 2500 SKR

Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro 4972255-6

Adres: Box: 152 16

161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

Bes e birakuji

● Rêving Hirûrî

Şeva serê salê ye, em li welatê xerîbiyê ne û xwecihên wî welatî vê şeva serê sala nû bi aheng û şahîyan pîroz dikin. Rûniştvanên bajarê em lê li meydankê, li benda bi dawîhatina sala kevin û destpêka sala nû xirvebûne. Dema seet bû dîwazde, dengê bilind yê zengên hemû dêran û dengê musîqayê û pekandina rakêt û yarîyên agirî tevî bişkurîn û kenî û kêf û tîlîfîyanî xêrhatinê li sala nû dikin û xatirê xwe ji sala kevin dixwazin. Belê, eve bi tenê şeva keyf û kenî û aheng û şahîya ye. Lê xuya ye qedera me Kurda ye, her tim derd û kovan û xem behra me ne. Di vê şeva serê salê de, li cihê şahî û kêf û kenîyê, em li ber telefonan bûn; me penaberên kurd ji hev û du pîrsa nûçe û xeberên welatî dikir, nûçe û axiftin giş bi êş û jan bûn, pîrî dilzarî û dilşikestin bûn. Belê me qala vê diyarî û destkefta mezin dikir ya ku serkirdayetiye Yekîtî û Partiyê ji bo sala nû pêşkeşî gelê me kirî. Wan dilê her kurdekî çi li nav û çî li derveyî welatî pîrî xem û kovan kir wan gula hevîya xelkê me çilmi-sandine ve.

Weha bû, di her ser salekê de dijminê dagirker sersala me bi diyariyên xembar û kujek pîroz dikir, mixabin ku îro her bi wî awayî ev sersala me ye.....

Mixabin ku hewar û gazî û gefên dost û dijminên Kurdan bi xwe jî li ser helwesta rêberatiyê Yekîtî û Partiyê yên xelet kar nekir.

Gelo gunehê wî xelkî çî ye, ev hevrikatî û ev şer her ji salên şestan û heta niha bi ser de hatîye sepandin. Bi hezaran qehreman-tîrî û dilsoztîrî endam û kadir û pêşmergeyên her du partîyan bûne qurbanîyên vê sîyaseta çewt ya navxwe û şerê xwekujîyê yê bê mane.

Her ev nakokî ye sedema mezin ya dirêjbûn û şikestin û ne biserkeftina hemû şoreşên gelê me. Ez li vir dixwazim ji aliyên sîwdar re bibêjim, ma ne bese ya wan bi vê nakokîya xwe ya xerabkar anî serê vî miletê bindest û perîşan? Ev miletê ku di tengavtîrî û dijwartîrî û nexwestîrî zirufan de dev ji welatê xwe bernedaye, ev miletê ku di wan rewşan de weku we berê xwe nedaye derveyî Kurdistanê. Ev miletê ku qada xebatê bernedaye û li berxwedayê û qurbanîyên bê hejmar di rîya serxwebûna xwe de daye û hindê xwe li ser dijminan ferizkirî û rewşeka weha peydakirî ku hûn jî di egera wê de vegeyriyan ve Kurdistanê û miletê hemû desthilat xistine nav destên we.

Her çende hûn di gotin û civîn û semîner û belavokên xwe de dibêjin ku hûn xwe li hember gelê xwe şermîzar dibînin û hûn gelek cara daxwaza lêbuhurîna jî dikin, lê bi ya min ew jî tenê bi ziman e û di praktîkê de çî nehate guhertin.

Ez bawer im di pîrseke wisa de daxwaza lêbuhurîna bê feyde ye û yê berpirsiyar rêberatiyê ne; miletî çarenivîsa xwe xiste di destên wan de û diviyabaya ew li asta wê berpirsiyarîya xwe ya mezin bana.

Divêt em hemû, endamên Par-

tî û Yekîtîyê û her kesekî din, bi kûrî hizra xwe di vê pîrsê de bikin. Divêt rêberatiya herdu partîyan û endamên wan baş hizra xwe di xwe û van reftar û kiryarên xwe de bikin. Divêt ew mêze bikin ka ew çend ji program û rêbazên partiyên xwe yên nivîskî dîrketine û ka ew bi hindê çend ji karwanê pîroz ê Kurdîniyê dîr ketine û bila pîrsiyara ji xwe bikin ka dê ev kiryarên wan çend delîveyên dîrokî yên giring ji dest miletê me bike û ka dê me ber bi kuderê bibe.

Ev şer xeterekî mezin e û ne bes gefê li parleman û hukumeta Kurdistanê dike lê her weha xetereke pîr mezin e li ser mana gelê Kurdistanê.

Piştî serhildana pîroz ya 1991 ê bi gotin û nivîsîn peywendiyên stratejîk di navbera Partî û Yekîtîyê de hatine çikirin lê di rastîyê de, di praktîkê de hevrikatiyêke pîr dijwar û xerap di-hate kirin. Her aliyekî ji wan dixwest ji kerbên aliyê din hejmar

Soz û peyman neman. Çend lihevhatin û çend peyman di navbera xwe de morkirin û lê vebûn? Min belavokên Partiyê xwendin, ew hemû gunehî dixin hustîyê Yekîtîyê. Her weha min belavokên Yekîtîyê ji xwendin, ew jî hemû gunehîdixin hustuyê Partiyê. Weha herdu hevûdu gunehbar dikin û kes nabêje mastê min tîrş e. Xetera mezin ew e ku hêzên biyanî, yên din delîveya xwe bibînin û êrîşa xwe binin ser Kurdistana Başûr û hingê peşîmanî feyde nake.

endam û çekdarên xwe zêdetir bike. Li cem wan qet giring nebû ka ew çî kes in dikevin nav rêxistinên wan, lê ya li ba wan girîng ew bû hejmara çekdar û endaman zêde dibe. Bi wî awayî gelek kesên ku bi xirabî û destdirêjkarîyên xwe pîr naskirî ketine nav wan herdu partîyan û gelekên ji wan berpirsiyarî jî xistine destên xwe. Kesên weha her rojekê li cihêkî problem û alozî peyda kirin û kêmasî û çewtîyên wan bûn yê partiyên wan û wan kesên gelekên din jî digel xwe xerapkirin. Mirov dikare bibêje ku arêşa û problem di navbera Partî û Yekîtîyê de di piraniya xwe de bi vî terzî çêbûne.

Tiştê din, devberdan ji partîyê û çûn yekser bo nav partîyêke din bû riyêke xwe zengînkirin û birêvebirina jîyanê û weha bîr û bawer keftine di bazarê kirîn û firotinê de û xelkine paqij jî pê hatine xerapkirin.

Her wisa jî wan rê li ber partiyên biçûk girt û çî di dest wan de nehişt û ew neçarkirin ku yan xwe bidin digel aliyekî ji wan herduyan yan jî bê bizav bimînin. Encamên monopolkirin û xwe zalkirinê bi ser hevûdu de ev nakokî û ew şerê van herdu hêza ye.

Li vê derê li derveyî welatî senga herdu partîyan hate warê û van şerên wan bê umêdfîyêke mezin di nav malbat û kesên kurd de peydakir. Ez bi bawerî me eger gelekên ji endamên herdu partîya dev ji wan bernedabe, bawerîya wan pê gelek xav û sist bûye.

Harîkarî, çî ji kurdên derveyî welatî û çî ji dostên gelê kurd eger bi yekcarî ne hatibe qutkirin gelek kême bûye.

Ev şer bûye eger ku raya giştî û ya fermî ya wan dewletan li hember herdu partîyan û hember pîrsa kurd bi giştî bi awayekî ne baş bihête guhertin.

Ya em dizanin partiyên Kurdistana Başûr ew hêz tune ye ku pê xelkê xwe û sinûrên başûrê Kurdistanê biparêze, hêzên hevsozan jî gefê dikin û dibêjin eger ev şer berdeyam be dîr nîne ew hêzên xwe ji Kurdistanê û êdî parastina sinorên me nekin û eger ev bû rastîyê û qewimî dê hingê çarenûsa xelkê me çî be?

Gazind tîrş kirin ku çî aliyên dewletî îûrafê bi hukûmet û parleman herêma Kurdistanê nakin, ma gelo kengî rêberatiyên Partî û Yekîtîyê bawerî bi vê hukûmetê anîne û hurmet bo wê û parlementoyê girtine da ku yê derveyî wan wê bikin? Ma kê avahiye parlemanê û hukûmetê dagirkiribû? Kê dam û dezgehên dewletê bê desthilat hiştibûn? Kê parlementer bê biha û îhane kirin? Kê û kê? Her wan herdu partîyan bi xwe, evca em bi çî rûyekî bibêjin xelkêkî din werin piştgirî û arîkariya hukûmeta me bikin.

Rêberatiyên Partî û Yekîtîyê digotin ku bi tivingê pîrsa kurd çareser nabe û şîret li Kurdên perçeyên din yê Kurdistanê dikirin bona ku rîya aşî û demokrasîyê bigrine ber xwe û dev ji xebata çekdarî berdin. Lê ew wî mafî didin xwe ku bo arîseyêke biçûk şerî li seranserê Kurdistanê belav bikin.

Wan bawerîyêke mezin bi yekîtîya axa Iraqê heye lê mixabin ku hewildana wan ew e Kurdistanê parçe parçe bikin. Ew weha îsbat dikin ku wan di vê qonaxa nazik û di vê taqîkirinê de neşîya îdareya Kurdistanê bikin.

Hê piçêke wextî di dest wan rêberatiyan de maye ku birîna derman bikin ve heke dê ji dest wan jî derbikeve û dê eşîrî û xwindarî û xerezên şexsî bi ser hemûyê de zal bibin û dê bi giranî û bi dijwarî li ser me hemûyan timam bibe û dê şûnwarên wê pîr dijwar bin.

Îro ya ji hemûyan girîngtir ew e ku her kurdek li kuderê be li Kurdistana xwe xwedî derbikeve. Ji bilî daxwaza şer rawestandinê jî rêberatiyên herdu partîyan her kesek jî me desthilata xwe bi kar bine û em biryara xwe bikin di dest xwe de û bi dijwarî li dijî şerê navxwe rabiwestin. Ne me şer divêt û ne em şerî dikin û yê şerî dixwaze û şerî dike me nevet û divêt em bizanibin ku "wext şûr e, mirov yê hişyar nebe dê mirovî bibire."

Soz û peyman neman. Çend lihevhatin û çend peyman di navbera xwe de morkirin û lê vebûn? Min belavokên Partiyê xwendin, ew hemû gunehî dixin hustîyê Yekîtîyê. Her weha min belavokên Yekîtîyê ji xwendin, ew jî hemû gunehîdixin hustuyê Partiyê. Weha herdu hevûdu gunehbar dikin û kes nabêje mastê min tîrş e. Xetera mezin ew e ku hêzên biyanî, yên din delîveya xwe bibînin û êrîşa xwe binin ser Kurdistana Başûr û hingê peşîmanî feyde nake. □

NEYNIK

Îro dîrok dîsa xwîna xortên xwe diherikîne

● Bilal Görgü

Berî 15 salan ez û çend heval çûn ba dostekî Kurdan, ew ne tenê dostê Kurdan bû herwisa Kurdnasek bû. Gelek pirtûk û meqalên wî bi zimanê Swêdî û Îngilzî çap bûbûn. Ew li Unîwersîteyê profesorê huqûqa mîletan bû. Wexteke dirêj jî li Wezaretê Derve ya Swêdê wek şewirmend kar kiribû.

Me ji camêr pîrsî ku ew di huqûqa mîletan de, li pîrsa Kurdî çawa mêze dike, Kurd jî wek mîletên din dê heqê xwe bistînin yan na?

Camêr li rûyê me mêze kir bi devkenî û bi dengêkî bilind got: "Bi raya min Kurd jî wek hemû mîletên dinê divê xwedîyê mafên xwe bin. Li gor huqûqa mîletan dayîna mafê Kurdan ferz e. Lê divê em tenê bala xwe nedin heq û huqûqên ku di kitêban de hatine nivîsandin û wek teorî mane. Di vî warî de şertên dinyayê yê îro gelek giring in. Aktûalîteya hinek tiştan dikare li pêşîya heq û huqûkan bibe asteng, ev ne li gor dilê mirovan e. Li gora pratîka dinyayê ez îro îhtimaleke mezin nadim ku Kurd bigehêjin azadiya xwe. Ji ber ku dewletên mezin tu carî nahêlin balansa navbera dewletên dinyayê bête guhartin, guhertina balansê bi xwe re riskên nuh tîne. Ji bo vê başûrin ew e ku dewletên ku Kurd tê de dijîn bi awakî li hev werin û Kurd hinek mafên xwe bistînin." Û camêrê me nexwest dîr û dirêj li ser vê pîrsê bisekine. Ez rastîyê bêjim ev dîtinên wî ji min re giran hatin, ji ber ku di dilê min de Kurdistaneke serbixwe hebû.

Lê gelek sal derbas bûn û gelek guhartin di cihanê de çêbûn. Van guhertinan ji me Kurdan re jî gelek tişt bi xwe re anîn. Bêaqiliya Seddam ku ajot ser Kuweytê û bala dewletên mezin kişand ser herêma Rojhilata Navîn û bi taybetî jî ser Iraqê. Rojavayîyan di Şerê Xelîcê de piştî Seddam şikandin, ew xûz kirin û rûyê wî reş kirin. Kurdan ev firsenda hanê bi kar anîn û 3/2 yê axa xwe rizgar kirin. Kurd jî wek hemû mîletên din di fiiliyatê de bûn dewlet, çûn ser sandixan, bi hîlbijartinê nûnerên xwe hîlbijartin. Bi vî jî neman heqê jinan, mafê kêmneteweyan ku li Kurdistanê dijîn dan wan, nûnerên wan kirin parlamentoyê û bi vî hawî parlamentoya Kurdistanê ava kirin.

Em Kurdên derveyî welêt bi kirinên wan şa bûn, serê me pê bilind bû. Ji ber ku heta wê rojê wexta em bi biyaniyan re rûdiniştin, me nizanibû çawa behsa welêt û hemwelatîyên xwe bikin. Ji wê rojê vir de, êdî dewleta me hêdî hêdî ciyê xwe digirt.

Dîsa ez û çend heval em çûn ba wî dostê Kurdan û ew peyvên ku berî 15 salan di navbera me de derbas bûbûn, hatin bîra wî. Camêr kenîya, kêfxweşîya xwe anî zimên, hîn me pîrsa xwe jê nepirsibû, wîE. Seyda: a me da, got: "Di şertên roja îro de her tiştî mumkun e, guhertinên van salên dawîyê wisa zû dibin ku em wext nabînin wan taqîb bikin. Kurd dikarin mafên xwe yê neteweyî û demokratîk bistînin û azad bibin. Lê kêmasiya Kurdan ku ez dibînim, tecrûba wan ya dewlet avakirinê û meşandinê kême e, ev yeka dikare ji bona wan probleman derxîne. Ji aliyê din divê hûn xwe îspat bikin ku hûn jî wek mîletên din karin bi serê xwe bijîn û xwe îdare bikin. Ew îmkanê ku ketine destê we ji bo we îmtihanek e. Dilxwaziya min ew e ku îcar hûn bi ser kevin, şansê we gelek mezin e".

Ew Kurdên ku bi kirinên Kurdên başûr serê wan bilind bûbû, dîsa li ber hevalên xwe yê biyanî hustuyên wan xwar bû. Wan bi sedan salan şerê rizgarî û azadiyê dabû, îro rabûbûn dîsa bi hev ketibûn, bira xwîna birayên xwe dirijand. Bajar û gund bûbûn du beş, dixwestin koka hev bînin û malên hev wêran bikin. Ji bo vî şerê navxwe jî zikê Kurdên derveyî welêt xwîn diçû. Wan nizanibû çî bikin? Wek berê nikarîbûn herin ber deriyên sefaretên Tirkan, Ereban û Eceman. Guman tê de tune ye ku dijminên me bi vê rewşa me şa dibin.

Welatên bindest û paşdemayî wexta bi şerê çekdariyê digihîjin armanca xwe û hin mewzîyan bi dest dixin problemên wan xelas nabin, bilekis nuh dest pê dikin. Ji bona ku ew jiyana nuh bi cih bibe, şax û bask bide bi kêmasî divê hin prensîbên esasî bi cih bikin.

Dewletek tenê bi hukûmetêke ava nabe, divê teşkilatên îdarî, dezgehên ilmî û civakî ava bibin. Divê parastina dewletê li ser her tiştî be. Teşkilatên polis û pêşmerge bîr avakirin, mahkemeyên sîvil îcra bibin, organên qanûndarî, birêvebirin û mahkemeyên çêbibin, teşkilata belediyê bê damezirandin. Divê civat di her warî de bibe xwedî rêxistin. Ev hemû dem û dezge bîngê danîna dewletê ne. Tu dewlet bê van dem û dezgehan nikarin bimeşin.. Ji aliyê din bona ku dewlet karibe kar û barê xwe bimeşîne, ew hewcedariya pareyan e. Divê hemû hatîniyên gumrukê, dewlemendiya bin erd û ser erd, bi destên dewletê tenzîm bibin, hemû çûyinên dewletê resmî bin, tişt ne li gor şexs û hêzan bin.

Divê şertên demokratîk bi cih bîr. Parlamentoya Kurdistanê bi hîlbijartinê pêk hat; divê piranî hukûmet, hindikayî muxalefet be. Ku em vî riyê taqîb nekin wê gavê xwestin û berjewendiyên şexsî derdikêvin pêş, emê bi gotina serokeşîr, şex û kesên ku qeweta wan di civatê de heye, bikin. Ev jî malwêraniya Kurdan e. Despotîzm li ser civakê hakim dibe û mîlet jî bin despotekî xelas dibe, dikeve bin destê despotêke din. Ferqa zordar û despotan jî ji hev nîne.

Berî her tiştî divê Kurdên Iraqê jî xwe bipirsin, gelo ew çî dixwazin? Heger xwestina wan azadî, serkoftin û pêşketin be, divê ew rêya demokrasîyê hîlbijêrin û guh bidin deng û xwestinên mîletê Kurdistanê. Lê ku ew riyên din hîlbijêrin encama wê jî rewşa Kurdan ya îro ye. Dê dîsa dayikên Kurd li singên xwe bixin û bêjin ax û wax. Îro dîrok dîsa xwîna xortên xwe diherikîne.

RAMANÊN RAMANWERAN

Divê meriv zikir û îbadeta hezar salî bi kaseyek şerab nede

Zinarê Xamo

Ji meha yanzdan ya 1994'an û vir de ye Orhan Kotan li Tirkîyê rojnameyêke bi navê *Realîte* derdixê. Berî nuha bi çendekî çar hejmarên ve rojnameyê (heta nuha çar hejmar derketine) ketin destê min jî. Berî ku *Realîte* têkeve destê min, radyoya Swêdê, programa Tirkî (28.10.1994) li ser armanç û siyaseta *Realîte* bi O. Kotan re hevpeyvînek kiribû. Di wê programê de jî O. Kotan hema hema ev baweriyên ku nuha di *Realîte* de tîne zimên, parastibûn.

Wek Rizgarî û Kurdistan Pressê, di *Realîte* de jî O. Kotan dîsa hin gotinên şairane dibêje, hin teoriyên "orjînal", hin fikir û dîtinên xwedêgiravî "realîst" davêje ortê û li ser wan jî xwe re hin spekulasyonan çêdike. Wê bête gotin ku gotinên mezin, teoriyên komployê û spekulasyon xusûsiyetên O. Kotan ên karakterîstîk in. Lema jî ne pirr xerîb e ku di *Realîte* de jî tiştên wiha hebin. Ev hemû rast in. Lê di *Realîte* de tiştên li ser navê realîstbûnê tene parastin tiştên pirr ciddî ne. Ji ber vê yekê jî divê dîtinên O. Kotan bêne munaqêşe kirin.

Ji avabûna Cumhûriyete û vir de têzêke dewletê ya resmî li hember Kurdan heye. Li gor vê têzê, li Tirkîyê geşêke Kurdan a millî tune. Kurd jî wek Tirkan xwediyên hemû mafan in. Lê hin dewletên xêra Tirkîyê naxwazin tim Kurdan li hember dewletê pîj dikin. Bi vê riyê dixwazin re li ber pêşketina Tirkîyê bigrin, ji bo ku Tirkîye li herêmê nebe qeweteke mezin. Lema jî koka problema Kurdî ne li hundur e, li der e. Îthama dewleta Tirk li hember Serhildana Şêx Seîd jî ev bû û îro jî ev e.

Gava dewleta Tirk PKK'ê, şerê Kurdan yê îro jî bi vê yekê îtham dike pirr ne xerîb e, meriv fahm dike. Helbet dewletê wiha bibêje. Ma ne qey wê bibêje, Kurd bi heq in û wek her milletî ew jî doza mafên xwe yê millî û demokratîk dikin. Bê guman meriv tiştêki wiha jî dewletê napê. Lê gava O. Kotan jî bibêje ku şerê îro li Kurdistanê dom dike êdî ne şerê Kurda ye, merkeza vî şerî li derve ye, bixwaze nexwaze wek Kurdekî meriv pê diêşe. O. Kotan, di hevpeyvîna xwe ya radyoyê de (28.10.1994) ev merkeza vî şerê kir, got ku Sûriye, Îran, Rûsya, Almanya, Amerîka û Înglîstan li pişt vî şerî ne. Gava dewlet bixwaze vê meselê bi PKK'ê re hel bike, divê bi van dewlatan re jî rûne.

Li gor îddîa O. Kotan hemû Ewrûpa alîkariya PKK'ê dike, lê haya me jê tune. Bi ya min hewqas fantazî jî nebaş e, meriv jî ciddiyetê dîr dixê. Lê hinek jî dikarin bibêjin ku berê dewletê di-

got, me digot dijmin e, derewan dike. Lê va ye Kurd jî dibêjin. Ma êdî meriv dikane jî vê îddîayê re jî bibêje derew e?

Bê guman gava O. Kotan dibêje ku ev dewletên jorin hemû li pişt vî şerî ne, ne rast e. Em Sûri û hetta derecakê jî Îranê bidin alîkî, her kes dizane ku Almanya, Amerîka, Rûsya û Înglîstan ne li pişt vî şerî ne. Yê eksê ve îddîa bike, bêbextiyê dike. Wek O. Kotan dibêje, heger van dewletên Ewrûpî hemûyan bi rastî alîkarî kiribûna nuha Kurd jî zû de ji bin ve zulmê xelas bûbûn. Lê, nakin. Di vî warî de erê dengyên dunyayê û menfeetên wan ên maddî roleke mezin

Ya din, berî her tiştî "merkeza" vî şerî, wek O. Kotan dibêje ne li derve ye, li hundur e û şer jî bîzzatîhî yê Kurda ye. Ji dewletekê alîkarî girtin kerektera şer ya millî naguherîne. Kurdan do jî û îro jî tim jî bo xwe şer kirine, ne ji bo hinekên din. Lê gelek caran hatine xapandin û zirarên mezin dîtine. Lê belê ev nayê wê maneyê ku ew tim bûne peyayên xelkê. Bira jî bin nexapin.

dilîze, lê Kurd bi xwe jî ne bi kadir û serokên xwe û ne jî bi mutefîk û hedefên xwe yê siyasî baweriyê nadin wan. Numûna Kurdistanê Başûr li ber çava ye.

Ya din, berî her tiştî "merkeza" vî şerî, wek O. Kotan dibêje ne li derve ye, li hundur e û şer jî bîzzatîhî yê Kurda ye. Ji dewletekê alîkarî girtin kerektera şer ya millî naguherîne. Kurdan do jî û îro jî tim jî bo xwe şer kirine, ne ji bo hinekên din. Lê gelek caran hatine xapandin û zirarên mezin dîtine. Lê belê ev nayê wê maneyê ku ew tim bûne peyayên xelkê. Bira jî bin nexapin.

O. Kotan jî dizane ku Kurd wek millet li ser axa xwe jî hemû mafên xwe yê millî û demokratîk bê par in. Ji ber vê yekê ye jî gava Kurd îmkanê dibînin serî hildidin, dixwazin xwe rizgar bikin ya jî bi kêmanî hin mafên millî bi dest xî. A jî ve nuxtê û pê ve alîkariya hin dewletan aktuel dibe. Ji ber ku şerê çekdarî mahkûmî ve alîkariyê ye. Lê "dewletên" ku alîkariyê didin Kurdan (îro PKK'ê) problemeke tune li Tirkîyê naxuliqînin, bilekîs jî ber ku ev problem heye hin dewlet alîkariyê dikin. Yanî gava

Kurd ne bindest bûna wê şerê PKK jî tunebûya û wê Sûri jî alîkarî nekira. Ji ber vê yekê jî alîkariya Sûri ne sebeb e, netîce ye. Alîkariya derve hebe jî tunebe jî kême zêde Kurd wê dîsa şerê xwe yê millî bidomînin. Çimkî dînamîkên tevgera Kurd ne li der e, li hundur e û heta ku ev dînamîk hebin wê hêzên Kurd jî hebin û ewê li ber xwe jî bidin.

Dibe ku kêfa meriv jî PKK'ê re neyê, meriv siyaseta wê rast nebîne, taswîb neke, li dijî danûstendinên wê ya bi hin dewletan re be. Lê divê ev yek nebe sebeb ku meriv wek O. Kotan rabe bibêje "merkeza vî şerî li derve ye." Nizanim Amerîka, Almanya, Înglîstan û Rûsya li pişt vî şerî ne. Ev ne rast e. Merkez ne li derve ye, merkez li Kurdistanê ye. Û heta ku ev millet wek îro bindest be wê ev şer jî pirr hindik her bidome. Çewtiyên PKK'ê divê nebe sebeb ku meriv ve rastiye tahrîf bike. Û ya din divê em ne li dijî alîkariyêke wiha bin jî, xwezî alîkarî bikirana, divê meriv bixebite ku bikin.

Em hemû Kurdên bi siyaseta mijûl dibin baş dizanin ku O. Kotan jî demekê şîara "Kurdîstana serbixwe û yekbûyî" paras tiye. Û ez dikanim bibêjim ku di vê xetê de ew jî gelek kesî bêtir bê tawîz bûye. Û di vî warî de jî bûye xwediyê programeke siyasî. Lê îro hatiye nuxtêyêke din, dibêje parastina şîareke wiha "pankurdîzm" e. Û ne ew tenê, tew dibêje jî xwe meriv bi tu hawî nikane sînorên Kurdistanê jî deyne:

- Şîara Kurdistanê serbixwe û yekbûyî karaktereke pankurdîst îhtîwa dike. Ferqeke esasî ya pankurdîzmê jî panturkîzmê tune. Ev herêma ku îro jê re Kurdistanê gotin herêmeke wiha ye ku bi hezaran sal, bi sedan medeniyet li ser wê jiyana xwe domandine. Qet ne mumkûn e ku meriv kanibe sînorên ve axê diyar bike. Ji ve jî bikeve, bi Kurdan re gelek gelên din jî bûne xwediyên ve coxrafya yê. Koka Ermenîyan li van erdan e. Asûri-Suryanî li ser van erdan jiyane. Û gelek grûbên etnîkî yê din li ser ve coxrafyayê bûne xwediyên eynî qederê. Û li ser ve axê hin doza heq dikin. (Realîte Hejmar. 2)

Li vir O. Kotan gelek rastî û çewtî tevhev kirine. Û ez bi xwe baş tîngîhîjim gelo jî bo çî wiha kiriyê? Ez dizanim zanîna wî ya tarîxê tîra jihevderxistina ve rastiye dike. Lê li gel ve jî wî rastî rast negotiye.

Rast e, bêyî Kurdan gelek qewm û împaratoriyan din jî li ser ve "coxrafyayê" jiyane û hukum kirine. Ji wan hinek mane, hinek nemane. Ev faktên tarîxî ne û tu kes ve tarîxê înkâr nake. Lê mesele ne ew e. Mesele welatê Kur-

dan heye ya tune? Heger O. Kotan dibêje tune ew tiştêki din e. Lê gava hebe, wê sînorên wî jî hebin. Çaxa li ser axa Kurdistanê hin milletên din dijîn hebin, ev nayê wê maneyê ku Kurdistan ne welatê Kurda ye. Ha, mumkûn e ku O. Kotan wek însanekî demokrat û rastgo doza mafê qewmîyatên din dike, ev jî mafê wî ye. Lê ji bo vê yekê ne şert e ku Kurdistanê bike "coxrafyake sînor ne diyar" û bi vê riyê jî Kurdan bê welat bihêle. Tirk dibêjin welatê we heye lê em nadin, lê O. Kotan dibêje tew welatê we tune. Îcar tiştê tune jî xwe meriv nikane doza wê jî bike.

Gava O. Kotan dibêje ku Kurd, "Kurdîstaneke serbixwe û yekbûyî" dixwazin rast nabêje.

Lê ya xerab, O. Kotan ne tenê ji alî tarîxî ve Kurdistanê dike welatekî bêxwedî, her wisa wek millet, Kurdan jî ji alî sosyolojîk û fizîkî ve diqedîne. Li gor wî jî sedî heftêyê Kurdan koçî Xerbê kirine, Kurdistan vala bûye. Û yê li Kurdistanê mane jî esker û milîsên gundan in. Û kesên koçî Ene-dola Rojava kirine jî daxwazeke wan a serxwebûnê tune. Hetta ne ya wan tenê, li gor wî, Kurd jî bin de doza serxwebûnê nakin. Lema jî munaqêşa ve daxwazê bêmane ye.

Ma îro li Tirkîyê, li Îranê, li Sûriyê û li Iraqê Kurd, (hin grûbên marjînal ne tî de) Kurdistanê serbixwe û yekbûyî dixwazin? Na, ku bixwazin jî helbet heqê wan e û divê O. Kotan jî li dijî ve daxwazê dernekeve, lê tiştêki wiha tune. Li her çar perçeyên Kurdistanê jî Kurd îro heqên pirr biçûk dixwazin. Wek O. Kotan dibêje, nabêjin bêyî Kurdistanê serbixwe û yekbûyî em tiştêki din qebûl nakin. Ma ne li Tirkîyê em dibêjin bila dewlet wek Kurd bi hawakî resmî me nas bike û zimanê me serbest bihêle. Lê O. Kotan van rastiyan hemûyan dide alîkî û fena ku çewtî jî Kurdan de be wan rexne dike. Li gor wî, Kurd daxwazên ne mumkûn, ne realîst didin pêş, doza Kurdistanê mezin dikin û lema jî ew "pankurdîst" in. Lê ev îddîa ne rast e, Kurd tiştên ne "realîst" naporêzin.

Li aliyê din gava Kurd, "Kurdîstaneke serbixwe û yekbûyî" biparêzin jî wek O. Kotan dibêje nabe "pankurdîzm." Çimkî em dizanin "panturkîzm îdeolojîyêke dagîrker û paşverû ye.

Xwediyên ve îdeolojîyê dixwestin li dunyayê împaratoriyeke Tirkan ava bikin. Ma Kurd jî li pey tiştêki wiha ne ku meriv jî wan re jî bibêje "pankurdîst"? Ez bi xwe tu wekhevîyê di navbeyna "panturkîzm" Tirkan û "pankurdîzm" Kurdan de nabînim. Wer diyar e ku O. Kotan hin mefhuman çewtî û li gor kêfa dilê xwe bi kar tîne.

Lê ya xerab, O. Kotan ne tenê ji alî tarîxî ve Kurdistanê dike welatekî bêxwedî, her wisa wek millet, Kurdan jî ji alî sosyolojîk û fizîkî ve diqedîne. Li gor wî jî sedî heftêyê Kurdan koçî Xerbê kirine, Kurdistan vala bûye. Û yê li Kurdistanê mane jî esker û milîsên gundan in. Û kesên koçî Ene-dola Rojava kirine jî daxwazeke wan a serxwebûnê tune. Hetta ne ya wan tenê, li gor wî, Kurd jî bin de doza serxwebûnê nakin. Lema jî munaqêşa ve daxwazê bêmane ye.

Herçî îddîa ku jî sedî heftêyê Kurdan koçî kirine ne rast e, îspateke wê ya ilmî tune. Wek her tiştî, di vir de jî O. Kotan pirr lê zêde dike. Diyar e dixwaze wer be. Lê em bibêjin ku wek O. Kotan e yanî deh milyon însanî bi darê zorê welatê xwe terk kirine. Ma ev yek tê wê maneyê ku êdî heqê Kurdan e serxwebûnê nemaye? Ma jî bo ku Kurd bibin dewlet divê panzde milyon bin? Du milyon Kurd li Kurdistanê bimînin jî dîsa Kurdistan welatê wan e û mafê wan heye ku ew jî wek milletên din pêşeroja xwe tayin bikin. Îzland li dora dused û pêncî hezarî ye lê dewlet e. O. Kotan di dîlî ku li dijî ve wahşeta dewletê derkeve, ji bo vegera wan însanan bixebite, radibe dibêje, kesên çûne venagerin, nizanim daxwazeke wan a millî tune. Ez fahm nakim, çima O. Kotan bi xwe ev sî-çil sal in ku jî Kurdistanê derketiye lê hîn jî daxwaza hin tiştan dike; îcar çima ev tişt wê jî bo kesên din ne wiha be!

O. Kotan wek merivekî ku qet bi tarîxa Tirkîyê ya kevn û ya nuh nizanibe qala "mozaîka" gelan dike. Lê ew jî bir dike ku xerçê ve "mozaîkê", do jî û îro jî ne bi zebat û xwîdana gelan, lê bi hêşir û bi xwîna wan hatiye çêkirin. Ji ber vê yekê jî teşbîha "mozaîkê", teşbîheke çewt e û rastiya tarîxî nayne zimên. Heta do O. Kotan dîsa tarîxê dida xwediyên teoriya "mozaîkê", lê çî heyf ku îro ew bi xwe ve teoriyê diparêze. Helbet ev jî guherandîneke, lê guherandîneke trajîk e. Bi parastine teoriyên wisa O. Kotan zikir û îbadeta xwe ya hezar salî bi kaseyek şerab dide.

O. Kotan jî ronakbîrên Kurdan jî pirr gazinan dike, dibêje bi Tirkî dixwînin, bi Tirkî difikirin û bi Tirkî dipeyivin. Bi kurtî xwe li ber asimilasyonê ranagrin, pirr rehet asimîle dibin. Bê şik tiştê dibêje rast e û wek şexs meriv pê xemgîn dibe. Lê ya girîng ne gotin e, kirin e. Gelo di vî warî de ew bi xwe çî dike? Tiştê dike li ber çava ye: Ew jî bi Tirkî dipeyive, bi Tirkî dixwîne û rojnameyêke bi Tirkî derdixê. Îcar çima jî xelkê gazinan dike ez tê nagi-hîjim!

Hevpeyvîn

Endamê Komîteya Rêvebir yê YEKBÛNê Sîdar Eren:

"Me cepheyêke fonksiyoner divê"

Li ser sedemên biserneketina xebata platforma avakirina cepheyê neteweyî û demokratîk endamê redaksiyonê Lewend Firat bi endamê Komîteya Rêvebir yê YEKBÛNê Sîdar Eren re hevpeyvînek çêkir. Li jêr em vê hevpeyvîne pêşkêşî xwendevanên xwe dikin

Armanç: Ev nêzî du sal in ku di navbera 12 rêxistin û partiyên Kurdistanê Bakur de hewldana avakirina cepheyê hebû û gelek tişt ji hatibû safî kirin. Lê di dawîya Çileyay Paşin de beyaneke ji aliyê van 12 rêxistin derket ku ev hewldan bi ser neketiye. Di beyanê de tiştê konkret nahê nivîsandin û optimîzmek heye. Li gor we sebaba biserneketina vê hewldanê çi bû? Di vî warî de wek partiya YEKBÛNê dîtina we çi ye?

Sîdar Eren: Wek te jî di pîrsa xwe de diyar kir, di beyana 12 rêxistin û partiyên de, ku bi hev re, li ser rawestandina xebatên platforma Cepheyê derxistin, optimîzmek heye. Ev nahê wê mahneyê di beyanê de pîrsegirîkên ku pêşî li avabûna cepheyê girtine tunene. Berevacî hêzên Kurdistanê Bakur ku armanca wan destxistina mafên neteweyî yê gelê Kurd e, divê optimîzma xwe li ser pêwîstiya avakirina yekîtiya neteweyî wenda nekin. Ji ber wê yekê jî, rast e, di beyanê de optimîzm heye. Ev ne tenê mesele optimîzmê ye. Herwisa destnîşankirina pêwîstiyek esasî ya mercên bi serketina têkoşîna netewî ye. Eger em vê pêwîstiyê bi cîh neyînin, em nikarin biserkevin. Ji ber van sebebên em bi xwe optimîzma ku di beyana 12 hêzan de heye, xelet nabînin; daxwaz û hevîyên me ew in ku bi rastî jî her 12 aliyên ku îmze avêtine wê beyanê xwediyê optimîzmekê bin û vê yekê weke pêwîstiyekê binirxînin.

Di vê beyanê de sedemên neavabûna Cepha Netewî û Demokratîk a Kurdistanê Bakur yan jî biserneketina xebatên du salan bi awayekî giştî hatiye nivîsandin ew jî ev e; "cudabûnê esasî yê dîtînen rêxistin û tûnebûn yan jî kêmbûna baweriyên navbeynara rêxistin" sedemên esasî yê neavabûna vê cepheyê bûn.

Bêguman ev dîtînen giştî ne. Bi tenê ev tesbît mumkun e ku têrî fahmkirina sedemên biserneketina xebatên platforma Cephe neke. Lê raya giştî, li ser pîrsa Cephe jî dîtînen û helwestên rêxistin hindik be jî agahdar e. Li ser xetîmandina xebatên Cepheyê gelek munaqêşe hatine kirin. Xebatên avakirina Cepheyê di esasa xwe de ji meha çiriya pêşin ya 1993 de xetîmbû. Gelek hewldan hatin kirin da ku pîrsên xetîmandinê bînin çareserkin.

Partiya me di sewiyeyên cûda de hin aliyên van sebebên bi awayekî zelal aniyê zimên û dîtînen

xwe him berî Kongreya xwe ya Duyem ji aliyê Komîteya Navendî ve gelek caran diyar kiriye û him jî bi biryara Kongreya Duyem di rapora politîk de sedemên esasî hatine nivîsandin.

Bi dîtîna me PKK him bi dîtînen xwe yê li ser "Cephe" û pêwîstiya "yekîtiya neteweyî", him jî bi hecma xwe ya rêxistinî û bi helwestên xwe yê pratîk re da ku ev xebat û hewldanên avakirina "Cephe" bi ser nekeve. PKK nedixwest ku Cepheyêke desthilatdar, Cepheyek ku bikaribe di her pîrsên siyasî de xwedî biryar be û aliyên Cepheyê riayeta biryaran Cepheyê bikin, bê avakirin. Hêvî û daxwaza me ew e ku ev sedem rojek zûtir ji holê bînin.

Partiya me ji destpêkê heta îro di wê dîtîne de bûye ku eger di navbera hêzên siyasî yê Kurdistanê Bakur de yekîtiyek di sewiyeyê neteweyî de çênebe em di têkoşîna xwe ya neteweyî û demokratîk de nikarin bi serkevin. Ji bo vê yekê, ji nuha û pê ve jî em dê xebat û hewldanên xwe jî bo avakirina temsîl û îradeya siyasî ya yekîtiya neteweyî bidomînin. Sewiya şiyarbûna neteweyî, rewşa navneteweyî, pêwîstiyên tekoşîna rizgariya neteweyî, ji me hewldan û xebateke zêdetir dixwaze ku em di sewiya neteweyî de yekîtiyekê ava bikin û muxatabê pîrsa Kurdî û temsîla siyasî û neteweyî him jî bo gelê xwe û him jî di qada navneteweyî de derxin holê.

Her çiqas platforma Cephe ya Neteweyî û Demokratîk belav bû jî lê ji bo rêvebirina peywendiyên di navbera hêzan de komîteyek hatiye amadekirin. Ev komîte dê ji bo peydakirina şikl û naveroka xebatên hevbeş û peywendiyên di navbeynara hêzên siyasî yê Kurdistanê Bakur de xebata xwe bidomîne.

Armanç: Gelo tesaduf bû ku îlana xebata Parlamentoya Surgûnê eşkere bû, piştî çend rojan beyan ji aliyê 12 hêzan ve derket ku ev platforma cepheyê bi serneketiye? Û hûn vê parlamentoya surgûnê çawa dinirxînin?

S.Eren: Bi baweriyê me îlankirina "Parlamentoya Surgûnê" ji aliyê tarîxê ve ne tiştê tesaduf e. Ji aliyekî ve PKK'ê jî bo rakirina astengên li pêşiya avakirina cepheyê hewldanên ciddî nekirin, lê li aliyê din jî bi pêşniyar û hewldanên avakirina dezgehên neteweyî weke "Kongreya Neteweyî û Parlamantoya Surgûnê" ku ji cepheyê hîn firehtir û bilindtir in dan pêş. Ev yek, nişana ne ciddîbûna PKK'ê jî bo avakirina dezgehên yekîtiya neteweyî ye. Divê her kes jî xwe bipirse, gelo dema hêzên siyasî yê Kurdistanê Bakur di navbeynara xwe de hîn Cepheyek ava nekirin de çawa "Kongreyêke Neteweyî yan jî Parlamentoya Neteweyî" bê avakirin?

"Parlamentoya Surgûnê" di esase xwe de berdeewama xebata "kongreya netewî" ye. Wek ku raya giştî ya Kurdî pê agahdar e di

meha Îlona 1994'an de hin danûstendin ji aliyê çend parlamenterên DEP'ê ku derketibûn derveyî welêt çêbûbû û PKK'ê jî di hin weşanên xwe de li ser "kongreya netewî" hin nivîs belav kiribûn. Lê ji aliyê me hîn jî destpêkê xuya bû ku fonksiyona ku ew didin "kongreya neteweyî" him jî ali şiklê avakirina û him jî ali armancên xwe ve di dîtînen me de fêr qên mezin hebûn.

Di 14'ê Çileyay Paşin ya 1995'an de di konferanseke çapemeniyê de "Komîteya Amadekar ya Parlamentoya Surgûnê" hat îlankirin. Em vê xebatê berdeewama xebata "Kongreya Neteweyî" ya ku ji aliyê nûnerên PKK'ê û jî çend parlamenterên DEP'ê ve hatiye îlankirin, dibînin. Bi baweriyê me çî "kongreya neteweyî" be û çî "parlamentoya surgûnê" be divê berî her tiştî konsensusek (lihevhatinek) neteweyî di navbera hêzên siyasî de bê avakirin. Bi baweriyê me çî piçûk an jî mezin, her hêzeke siyasî ya neteweyî di avakirina yekîtiyekê netewî û siyasî de xwedî rol û cihêkî girîng e.

Yekîtiya neteweyî ji xwe jî navê xwe diyar e bi hecma rêxistinî ve nayê pîvandin ew ji aliyên hêzên cûda yê civata Kurd ve tê damezirandin. Hin alî mumkun e di warên rêxistinî yan siyasî de qels bin, hin alî xurt bin, lê ji bo serkeftina têkoşîna me ya neteweyî û demokratîk pêwîstiya her hêzekê bi hêzeke din heye. Heta ku lihevkerinek bi vî hawî di navbera hêzên siyasî de neyê avakirin, ne "kongre", ne "parlamento" ne jî yekîtiyekê di sewiya neteweyî de li gor layiqê navên xwe ava dibin. Ji xwe tu hêzeke siyasî-neteweyî, ne piştgirîya xebata "parlamentoya surgûnê" dike ne jî di nav de cîh digre. *Têkoşîna rizgariya neteweyî ne hewcedarê parlamentoyek "surgûnê" ye. Hwcedarê parlamentoyek, kongreyek, cepheyek neteweyî ye. Kurdên li surgûnê ji xwe xwediyê rêxistin û dezgehên xwe yê demokratîk in.* Loma ji dezgehên ku bi perspektîfa hate behskirin neyên avakirin, tenê dê bibin dezgehên hin rêxistinên taybetî. Weke ku raya giştî ya Kurdî pê dizane PKK'ê di vî warî de gavên din jî avêtibûn û bi ser neketibû. "Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê" ya ku di 1992'yan de ji aliyê PKK'ê ve hat îlankirin yek ji wan mînakên e. Biserneketina wan herçiqas ji aliyê PKK'ê ve eşkere nehatibe diyarkirin jî, jiyanê bi xwe nişan da ku wan ev dezgeh bi serê xwe çêkiribûn, ji bo wê jî bi ser neketibûn. Ji aliyê din baweriyê wan bi dezgehên wiha yê neteweyî tune ye û dibêjin em her tişt in. Ev dîtînen û hewldanên wan hem di warê siyasî hem jî di warên demokratîk û pişeyî de dibin astengên esasî li ber avakirina dezgehên pêwîst yê yekîtiya neteweyî.

Bêguman hêzên din jî di neavabûna Cepheyêke neteweyî de xwedî berpirsiyari. Lê ji ber ku PKK hêzeke xurt e, hewldanên wê roleke esasî di avabûn yan jî neavabûna dezgehên neteweyî de dilîzin. Em hevîdar in ew jî hel-

westên xwe yê xweperestî û teng dîr bikevin û ew dezgehên ku ji têkoşîna neteweyî û demokratîk re pêwîst in, rojeke zûtir bînin avakirin.

Armanç: Heta nuha di warê avakirina cepheyê de gelek hewldan çêbûne lê belê yek jî bi ser neketiye. Ya dawî TEVGER bû hin ji canazê wê li erdê ye. Ev pîrs tê holê ku şertên bingehîn yê avakirina cephe li Kurdistanê tune ye, hema hêz bi lez û bez tenê cem hev, haziriya avakirina cepheyê dikin, hêvî didin xelkê lê dawiyê ev hewldanên wan bi ser nakevin. Ev jî tê wê mahneyê ku şertên subjektîv yê avakirina cepheyêke neteweyî hîn kamil nebûne. Partiya we vê yekê çawa îzah dike?

S. Eren: Bi baweriyê min pîrs di ciyê xwe de ye. Te bi xwe hin aliyên E. Seyda: a wê jî got. Ji bo gelê Kurd di nav tevger û têkoşîna rizgariya neteweyî de ye, şert û pêwîstiyên objektîv yê avakirina cepheyêke her tim heye. Lê wer xuya ye hîn şertên subjektîv rê nadin ku yekîtiya avabûn. Ev şert jî nehazîrbûna partiyên siyasî ne. Ev partî û rêxistin yan jî aliyê fikir ne hazir in yan ew fonksiyonên ku cepheyêke dilîze, baş teneqîştine. Ji aliyê din bêbalansiya navbera hêzan e. Hêzên ku xurt in dixwazin vê xurtbûna xwe li hember hêzên din bi kar bînin. Divê ji bo yekîtiyekê neteweyî hêzên xurt û hêzên qels li hev bikin. Ji ber ku hêzeke siyasî çiqas qels be jî di civatê de xwediyê temsîlekê ye. Cephe ne platform yan jî dezgeheke ku hêzên siyasî rastî yan jî xeletiyên xwe, xurtî yan jî qelsiyên xwe bi hevûdu bidin qebûlkin. Cephe, platform û dezgeha di hedefên muşterek yê siyasî de lihevkerin e. Û ne tiştêke din. Nuha ez nimûneyek bidim. Di programa cepheyê de hedefa siyasî ya cephe, "Kurdistanêke serbixwe yan jî federasyon" hatibû danîn ku partiya me di vî warî de şerh danibû. *Dîtina me ew bû ku, Cephe li ser hedefa "bidestxistina mercên bi azadî bîkaranîna mafê çarenivîsa gelê Kurd" bê avakirin.* Yek ji wan hêzên ku bi xurtî li dijî pêşniyara me derket PKK bi xwe bû. Lê PKK bi xwe bi îmza Sekreterê Giştî Abdullah Ocalan, di nameya xwe ya ji bo hin serokdewletan de dibêje ku, "tu daxwazê me yê guherandina hidûdên Tirkiyê tune ye û di hundurê hidûdên Tirkiyê de em amade ne ku tenê her pêşniyarên we yê çareserkirina pîrsa Kurd qebûl bikin". Eger hêzên siyasî û taybetî jî hezeke xurt weke PKK'ê di daxwaz û hedefên xwe yê siyasî de istiqarêk peyda neke, tesîrên wê yê xirab li ser xebatên yekîtiyê jî çêdibin. Dema siyaseta rojanê ya partiyên û cephe li hev nekin, di jiyandê de gelek asteng derdikevin pêşiya xebatên hevbeş. Meseleyek din ew e ku fonksiyona yekîtiyan baş tespît nabe. Dema di platformên cûda yê xebatên hevbeş de hêzên siyasî

dev ji hewldanên "rastî yan jî xurtbûna xwe bi hevûdu bidin qebûlkin" dîr bikevin, mercên avakirina yekîtiyan dê hîn xurttir bibe.

Armanç: We di E. Seyda: a xwe de got ku gelek rêxistinên Kurdan ji bo avakirina cepheyê hîn ne amade ne. Carina tê bihistin ku "hin endam û bîrîmên YEKBÛNê jî diji wê ne ku YEKBÛN di şertên îro de bi PKK'ê re dikeve cepheyêke". Ev jî heta ciyêkê tê wê mahneyê ku YEKBÛN jî hîn bi temamî ji cepheyêke re ne amade ye? Gelo dîtina we di vî warî de çi ye?

S. Eren: Bêguman nuha ji hêzên din bê pîrsîn mumkun e YEKBÛN yan jî hêzeke din wek berpirsiyarê ve neserketinê bê dîtînen. Ji alîkî ve mumkun e em heq bidin van dîtînan jî.

Partiya me hertim ji bo avakirina cepheyêke ku bikaribe rola xwe bilîze xebitîye, fedakarî û tehamula pêwîst diyar kiriye. Me nexwestiye dezgehek dîplomasî yê rêxistîneke siyasî li derveyî welêt bi navê "Cephe" bê avakirin. Me ev dîtîna xwe bi awayekî eşkere aniyê zimên. îlankirina "komîteya amadekar a Parlamentoya Surgûnê" nişan û tesbîtkirina rastîya vê dîtîna me ye. PKK bi awayekî stratejîk li cepheyêke fonksiyoner ava bibe. Eger wisa be her rêxistin kare dezgehên xwe yê diplomatîk ava bike ev yek mafên wan yê tabî ye. Lê ev dezgeh nabin dezgehên yekîtiya neteweyî. Ji xwe PKK bi "Parlamentoya Surgûnê" jî xwe re dezgeheke dîplomasîyê ava dike.

PKK hêzeke siyasî ye, xwediyê dîtînen, program û perspektîfên xwe ye. Di gelek warî de dîtînen me ji hev cûda ne. Dema em dibêjin ji bo destxistina mafên xwe yê neteweyî û demokratîk dezgehên neteweyî pêwîst in, dîtînen me çiqas cûda bin jî, em çiqas rexne li hev bigrin jî di nav xebateke hevbeş de divê em cîh bigrin. Dîtînen Partiya me û endamên me di vê çarçeweyê de ne. Vê pratîka dawî jî nişan daye ku dîtînen û helwestên PKK'ê bûye sedemên esasî yê neavabûna Cepheya Neteweyî û Demokratîk ya Kurdistanê Bakur. Mumkun e gelek endamên YEKBÛN'ê ev tiştê berê tesbît kiribin. Ev jî bo endamên YEKBÛN'ê ne xeletiyek e. Cephe, divê PKK jî di nav de, bi her rêxistinên siyasî û neteweyî re çêbe. Hîn di mehên Hezîran û Çiriya Pêşin a 1992'yan de bi biryar û beyana Kongreya Yekem û Komîteya Navendî ya YEKBÛN'ê, me ev dîtîna xwe diyar kiriye û îro jî em xwediyê wê dîtîne ne. Meriv rûdine, munaqêşe dike dema nuxteyên muşterek peyda bûn, cephe çêdibe, peyda nebûn ev yekîtiyê çênabe.

Ji ber van sedeman, tiştên ku te di pîrsa xwe de anî ziman, nayê wê mahnê ku YEKBÛN wek rêxistin ji bo avakirina cepheyêke ne hazir e.

Dr. EBDULBASIT SEYDA:

Çîroka Kurdî ya gelêrî qehremanî, merdbûn, dilsozî û destpakîyê berz dike

Pirsên Kelepora Kurdî, ku ji destpêka ve serdemê ve ji alî dagîrkerên Kurdistanê bûye armanc û nişana windakirinê; gemkirin û xeniqandinê; diziya bêrûmet û talankirinê-bêguman, eşkere, ro li nivro û li ber çavên cîhana ku xwe wek mîratgira şaristaniya mirovahiyê dibîne- pirsine jiyânî, rojane û girîng in. Çînkî bi pirs-girêkên hişyariyê ve û bi rewşa çanda îroyîn a gelê Kurd ve girêdayîne.

Ev pirsana dikarin ji bo rewşenbîrên Kurd bibin palpišta li rehan temaşekirinê; herweha dikarin bibin pêwîstîyêke dîrokî, pêwîstîya lêgerîna li alavên hişyarî û zanîne da ku xwe biguhezin rexê dîtir, mebesta min ew rexê ku de cihêkî rastîn bo giyanên xwe, bo hebûna xwe, ji bo aloziya Kurdbûyîn û xwe kêferata nasnameya xwe tê de bibînin. Û hergav "hestên birîndar" ên ku de "birîna" rewşenbîrên Kurd ji rehên çavkaniyên seretayî binin bîra wî, de di çerçewa ve çanda talankirî de amade bin!

Renge ev hevpeyvîn me rakişîne bareya (haleta) rasteqîn a çanda-xewn da ku em bizanibin bê em ji kûderê hatine; ji kîjan dibistanê, bi çi radyoyê û bi kîjan televizyonê em perwerde bûne?

Renge ji ku ev hevpeyvîn ji bo çanda Kurdî çend raman û çend bîr û baweriyên felsefî bin, lê bêguman de ji devê pisporekî jêhatî, xwedan şîyan û gencîneyêke bêhempa ji çandeke bilind û dewlemend bin.

Dawî, renga ev hevpeyvîn ji bo pêkanîna mercên "mayîne"; mayîn wek hebûn, wek taybetmendiyêke giyanî-derûnî, wek xelkine cihê; cihê bi rabûn û rûniştina xwe, bi pişê û gerdişê û rewîştên xwe, bi hişmendî û dîroka xwe, renga ev hevpeyvîn neynîkek be da ku em wênaya şikestî ya realîteya xwe bi çavên hevîyê tê de bibînin.

Ehmed Huseynî

Armanc: Kelepor, dema bûri ye ango hema paşerojê yan mîratgiriyeke ku hê ji di me de berdewam e, bi kurtî ez dixwazim tu ji me re keleporê wek têrm bidî destnîşankirin?

E. Seyda: Kelepor wek têrm ji wan têrmên ku xwedî du rûyên bi hevdû ve girêdayî têt hejmartin. Mebesta min du rûyê ku ji hevûdû nayên cihê kirin. Hewldana ji hevdû cihêkirina herdû rûyan de me raserî pirs-girêk û aloziyan bike ku de ziyane bigihîne pirossa têgihîştina têrmê bi xwe. Rûyê pêşîn hişyariyane ye: Çarçewa wê ya giştî bi awakî negetîv dixuye, dema ku sînor di navbera têrma kelepor û çend têrmên dîtir têt danîn, renga destnîşankirina têrma kelepor aloztir bike bi taybetî eger ew têrmana di şuna wê de hatin bi karanîn wek: Ol, dîrok, netewe. Herwiha ew rû bi awayê eşkerekirina rêberî û nişanên têrma "Kelepor" bi xwe û ronîkirina veşartekên wê yên derûnî, têt bi sînorîkirin. Rûyê diwemîn ideolojî ye: Ev ji bi awayê ku her komîkekê hewldaye ku di koşeyekê ji koşeyên "Kelepor" e de cîwarêkî ji xwe re bibîne. Ev rûyaya encama wê hewl danê ye. Îca her komî kek an jî aliyek dixwaze helwêsta xwe ya îroyîn û ya pêşerojê bi alîkariya "Kelepor"ê biparêze, keleporê dipeyivîne da ku bîrûbaweriyên xwe bi durustiyê rapêçîne. Li vir, ez dixwazim ku em bi awakî zelal, bikaribin cihewaziyê têxin navbera têrma "Kelepor" û dîrok de.

Dîroka neteweyekê ji neteweyan dîroka paşeroja wê ye; Ku agahdariyên berfireh li ser qonax-

ên ku ew millet di wan re derbas bûye, di xwe de bi cî dîke bûyer û rûdan û asteng û aloziyên wê neteweyê, ligel barûdox û kawdanên civakî, aborî, siyasî, psikolojî û giyanî yên kû bi wê paşerojê re hevrêti kirine û tîkeli wê bûne. Zanistîya ku wan rûdan û bûyeran ku wan barûdoxan tomar dike; ber hev dike, dîrok e. Lê "Kelepor", ligel wan regezên ku naveroka dîrokê pêktînin, (lêvegêra ji ber xwe ve) li wan regezan e jî. Û hemî helwêstên nîrxandinaneyên li hember wan regezan pêkhatine, pêk têt, ev jî da ku bîn bikaranîn, û sîd ji wan bîn wergirtin; li beramberî astengên birêveçûna netewe de. Bi kurtî, "Kelepor" serencama berhemdariya ramanî û giyanî ya tîp û formên civakî û aborî yên paşerojê ye û (lêvegêra ji ber xwe ve ye), lêvegêra ku paşerojê li tevli anuha dike. Û "Kelepor" helwêstên rexnekariyane jî, yên ku bi alavên ideolojî wê serencamê bi awayên renga reng, dinerixînine.

Armanc: Kelepora Kurdî ji alîkî ve têt dizîn, ji alîkî ve têt tevlixwekirin û ji alîkî din ve jî têt guherandin, bi bawerîya te, alavên parastina ve kelepora mayî çi ne û çawan de parastin çêbibe?

E. Seyda: Ev pirs, bi dabeşkirina serzbûyî ya gelê Kurd ve û bi tuncbûna keyanê siyasî dewlet ve, girêdayî e. Çînkî eger dewlet hebûya, de bikarîbûya dezgehên ku pêwîste bar û parastina kelepora Kurdî li ser milên xwe hilgirin û vejînin himbêz bikira.


Lewra, em dibînin ku dagirkerên Kurdistanê hewldidin da ku

beşekî mezin ji kelepora Kurdî bi xwe ve girêdin û astengan li pêşiya wan kesên ku dixwazin li kelepora Kurdî xwedî derkevin, lê bikolin û bi awakî zanistî li ser rawestînin, derdixînin, na herê, dixwazin gelê Kurd û neteweya Kurd bi wê neteweyê ve yan jî bi ya din ve girêbidin. Wek nimunc: Îsmet seyf El dewle dibêje ku; "Kurd ji neteweya Erebi ne". Û hişmendîya Tûranî dibêje ku; "Kurd Tirkên çiyayî ne ji xwe nêrîna resmî ya Îranî dibêje ku; "Kurd ji gelên Îranê ne, li gelên ku Faris serkêşîyan wan dikin".

Gelek saz û stranên Kurdî îro bûne milkên Tirkan. Gelek serpehatî, dastan û çîrokên Kurdî hatine guherandin û xelkine dîtir ew kirine ji mafê kelepora xwe reng e tiştên ku bi serê Mem û Zîn û Sîyamend û Xecê hatine hindêk ji nimûneyan bin: lê tiştê ku ez dixwazim li ser rawestim: zanyar û ranyarên mezin ji Kurdan bi zimanên dagirkeran nivîsandine û berhemên wan wek beşekî ji kelepora wê neteweyê yan jî ji ya din hatine hejmartin. Wan wek Tirk, Erebi, Faris pêşkêş dikin lê carcaran, em bi sudfê, li Kurdbûna wan rast têt, em çend agahdariyên durust li ser bîrûbaweriyên wan, rastîya helwêstên wan, û ramanên wan, dinasin. Îro, li her çar beşên Kurdistanê û li dervî welêt, gelek zana û nivîskarên Kurd hene ku bi Kurdî nanivîsînin, îca gerek berhemên wan li kûderê bîn bi cih kirin, û piştî çend salan de çare-nûsa wan berheman çi be?

Ez bawer dikim ku, ev bare (hellet) pir aloz e, îca pêwîste hêz û şîyanên bê rawestan û zanistiyane bîn bi karanîn, û li ser hemî sewiyetan, da ku em bikaribin tiştêkî ber bi çav di warê parastina kelepora Kurdî de bikin, pêk binin. Lê bendeman û çavli-rêmana dewleta Kurdî, ku ava bibe û bi wê erkê rabe, di bawerîya min de şaşîf ye, çînkî di esasê xwe de, ev babat nayê bi şûnde hiştin. Em dikarin ji îmkânên ku îro li berdest in dest pê bikin, ji karînen şexsî, ji çandeyî yên ku îro em hest dikin ku bûne pêwîstiyek, ji komeleyên nivîskar, zanyaran, hunermendan, sazband û dengbêjan, dîrokanan, jeografîzanan, aborîzanan, pijîşk û oldaran ûwd. her yek dikare bi çîrokê mijûl bibe, peywendîyan bi dezgehên nav çeyî û navnetewî re girêbide, û bi kesên serbixwe re yên ku bi wê babatê mijul dibin...

Herweha, peymangêhên Kurdî yên ku îro li Ewropayê ne, çî resmî û çî serbixwe bin, dikarin li ser wê pirsê rawestînin û rolekê bilîzin. Çînkî bi azadî, bê çavdêriya dagirkeran, dikarin bilivîn û peywendiyên ber fireh çêbikin, herweha li jêr siya çalakî û xebatên aktîv dikarin konferans û civnan li dar xînin, ku di wan de, gelek pispör, ji hemî beşên zanîn û zanyariyên mirovî, bikaribin hevdû bibînin, ji xebatên hev sîde



A. Basit Seyda: Lê eger em paşerojê nizanibin û a nuha em di dudilî û xurbetê de û bê serkêşan bin, wê gavê, de dimenên pêşerojê ta sînorê metirsîyê tarî bin.

wergirin û bîrû baweriyên xwe li ser awayên parastên û vejîna keleporê bi hevdû bigihînin. Di vî warî de, pêwîs e, girîngiya damezîrandin navenda zanistî ya zimanê Kurdî bê gotin, ku ev navend li ser zaravayên Kurdî dîr û dirêj rawest e û bi tundî li ser zimanekî hevgerî bixebite, zimanekî û alî navbera hemî zaravayan de hevbeş be di heman wext de mesela elfabêyê lafînî bi cih bike çînkî, dîr an nêzik, em de li beramberî wê pirs-girêkê rawestînin, lewra her ku çareserkirina wê dereng bikeve de alozî û asteng berfirehtir bibin.

Di vî warî de, hukûmeta Kurdistanê Îraqê dikare bi vî karî rabe, çî alî diravî be û çî jî alî tecrûbe û kadir û zanîne be û çî jî alî dezgehên ku dikarin beşdarî wan pirsan bibin.

Gerek em pişgiriya aborî ji bîr nekin, pêşî em bikaribin wek Kurd ve zemîne amade bikin, pişt re, ligel -UNESCO- wek nimûne, bipeyivîn. Da ku beşdarî parastin a kelepora Kurdî bibe û alîkariya aborî ji kes û dezgehên re ber dest bike.

Armanc: Îro rewşa gelê Kurd, ji ber barûdoxên siyasî, rê nade tu helwêstên cidî da ku bibin alîkarê damezirandina nêrîn û baweriyên giştî bo pêşerojê, di vî warî de tu çawan dibîni?

E. Seyda: Pirsê keleporî, di van herdû bareyan de girîngiyêke cihewaz (istîsnaî) wertigre:

1-Bareya lêgerîna li rêçên hişyariyê û li sedemên geşbûne.

2-Bareya hewldana ji bo çesîpandina kesayetiya netewî.

Bareya pêşîn bi neteweyên xwedan dewlet ve girêdayîye. Prona-

meya geşkirinê, bi giştî, erk û çalakiyên dewletan e. Li vir pirsê keleporê bi awayê gûftûgoya li ser kevneşopî û nûjeniyê rû dide, bi kurtî wisa ye: çawan em dikarin şaristaniya serdemê wergirin, û çawan em dikarin alavên şîyan û hêzê bi destê xwe xînin, û di wê navê re, em sîmayên bingehîn yên kesayetiya xwe ya netewî winda nekin.

Lê em Kurd, ta nuha, resenî (esalet) û nûjenî, wek pirs-girêk, di civata me de rû nedaye. Lê di civatên ku îro dewlet in, ev pirs-girêk, ji mêj ve bi gelek formên hatiye çareserkirin: civata Tirkyê- wek nimûne -di destpêka salên 1920 î de li hember wê pirs-girêkê rawestîya - eger bi kotekî be jiber bi serdemiyê ve rakişîya. Tîpên Erebi guherand û "ilmaniyet" hilbijart ...

Civata Îranî, di dema Şah de hewldida ku xwe bike wek rojava ji milekî ve rewîst û baweriyên ku şahînsahiyê kurtir bike biparêze ji milekî din ve wan di xwest wek Japonîyan wê pirs-girêkê çareser bikin, bêyî ku ew ferqa bingehîn di navbera wan de jîbîr bikin. Japonîyan guhdan teknolojîya aşîxwaz û xwe spartin hêza xwe ya netewî, lê şahînsahê Îranê xwe bi xelkên dîtir xurt dikir û teknolojîya leşkerî pêş ve dibir. Eger em berê xwe bidin civata Ereban, emê bibînin ku, pirs-girêka resenî û nûjeniyê, di dewleta Erebi-Îslamî de (dawiya qonaxa Ebasiyan) dimenên olî wertigre, û bi awayê yan jî di bin navê (pîrsa aqil û guhestinê) de rû dide. Ango di bin navê (li hevnanîna Felsefê û deqê tekst Qurânî de) rû dida, lê di roja îro de yan di qo-

peyivîn

naxa nêzik de sîmayên netewî werdigire, lê di vê qonaxê de jî em dibînin ku baweriyên olî jîndariya xwe diparêzin, ev jî di bîr û baweriyên kevneperestan de xweş têt xuyanî kirin. Renge ev jî tişteki normal be; eger em xweşik li peywendiyên di navbera islamê û Ereban de wek netewe, bînin bîra xwe.

Lê eger em bi çavên Kurdî li pîrsa keleporê temaşa bikin, emê bibînin, ku ew bi xwe di nav bareya diwemîn de bi cih dibe. Ango hê em hewl didin da ku em mafê xwe bistînin û keseyatiya xwe ya netewî biparêzin û biçesipînin -ji xwe hetanî anuha hebûna gelê kurd li Tirkî, Sûrî û Îran, bi awakî destûrî, nayê nasîn.

Îca bi doxên îroyîn de, xwe girtina bi reseniyê ve ye bêtir ku em keliha rexnekariyane ji bîr bikin. Eger ez vê baweriyaya xwe bêjim, bawer dikim tu jî li gel min î ku, em gelekî li ser dîroka serhildanên Kurdan radiwestin mîna ku kelepora me tenê ev serhildan û li nik sînorên wan radiweste. Em gelekî li cem wan kesên ku hest û nestên Kurdayetiya xwe û baweriyên xwe yên neteweyî bi helbestan û bi nivîsandinê; di serdemên dawîn de derbirîne, radiwestin, lê em kelepora Kurdî ya kevnar û kevintir, ya beriya islamê ji bîr dikin. Li vir ez dixwazim xebata bê hempa ya nemir M. Emîn Zekî di pirtûka navdar "Xulaset Tarîx Kurd û Kurdistan" bînin zimên, lê mixabin ku ew xebat berdeham nebûye, çînkî lêkolînên nû li ser me ferz dikin ku em li gelek jêderkirinên (istin-tacat) veşerî, wusa bêtir ku em giranbûhayîya pirtûka wî ji bîr bikin.

Li ba me, têma "Kelepor" li tevî ya "Dîrok" dibe, lê ew bi xwe nakokîyeke mezîni di navbera wan de heye, "kelepor" bi rûyê xwe yê rêberî jî dîrokê berfirehtir e. Çînkî kelepor dîrok e û helwestên rexnekariyane yên li hemberî dîrokê ye û derbasbûna wê bo anuha ye jî."

Eger em bikaribin bi gelemperî bareya danûstendî de navbera (paşerojê û anuha) de têbigihêjin, emê bikaribin bi xwebawerîyeke mezintir ber bi pêşerojê de herin.

Lê eger em paşerojê nizanibin û a nuha em di dudilî û xurbetê de û bê serkêşan bin, wê gavê, dê dîmenên pêşerojê ta sînorê metirsiyê tarî bin.

Armanç: Eger Kurd dest bi lêkolînên keleporî bikin, di baweriyaya de, merc û hokerên ku dê alîkariya damezirandina ve lêkolînê bikin çine?

E.Seyda: Wek ku berê min gotibû, di vî warî de hebûna îzgehên berpirsiyar pir girîng e. (Peymangêh-navendeyên lêkolînan-naven-deyên ziman) û guhdana şexsî ya kesên pispor, lê beriya her tiştî hebûna kadroyan di hemû beşên zanistî de pêwîst e wek arkiyolojî, dîrok, zimanên kevnar, filolojî, entarpolojî, mîsoloji, sosyolojî, ekonomî, felsefê û edebiyat, herwiha gerek mirov di vî warî de li ser pêwîstiya karê hevbeş bipeyive, çî li beşekî Kurdistanê be û çî jî li ser sewiyeta her çar beşan be; her wisa gerek pêwendiyên taybetmend ên çandeyî li gel hemî peymangêh û îzgehên navnetewî yên

ku guh didin qonaxên dîroka Rojhilata Nêzik nemaze ya kevnar, bîr çêkirin, di vî warî de çalakiyên hevpar dikarin bîr çêkirin wek; berhevkirina dest-nivîs û pirtûkên kevnar û lêgerîna li wan pirtûkan di navendeyên rojhilatnasîyê de li Rûsyayê, li Azerbeycan û Firansayê, li Brîtanya û Elmanya û li Emerîkayê, li Eyran û Tirkî û Iraqê û peyda kirina rêçine xebatê da ku destê Kurdan bigihêje belge û pirtûkên zindankirî li wan welatên dawîn. Gerek kelepora devîkî bêt berhevkerin; bi dîketîna nûçeyên kolînê arkiyolojî yên nû, xwendina kevir, belg û ferşên kevnar, weşandina kovarên taybetmend, rêzkerin û vekolîn û lêpîrsîna li destnivîsan û li belgan li weşandina wan, çapkirina pirtûkên keleporî û lêkolînên ku bi wan ve girêdayî, belavkirina wan pirtûkan li jêr mercine diyar, çînkî di vî pêla dawîn de gelek pirtûk bi navê keleporê derçûne bêtir ku tu peywendîya wan bi naveroka keleporê hebe, lê

Lê eger em bi çavên Kurdî li pîrsa keleporê temaşa bikin, emê bibînin, ku ew bi xwe di nav bareya diwemîn de bi cih dibe. Ango hê em hewl didin da ku em mafê xwe bistînin û keseyatiya xwe ya netewî biparêzin û biçesipînin -ji xwe hetanî anuha hebûna gelê kurd li Tirkî, Sûrî û Îran, bi awakî destûrî, nayê nasîn.

piraniya wan bi edebiyat û dîrokê ve girêdayîne. Ji xwe beşekî pir jî wan pirtûkan li jêr sewiyeta ku têt xwestin, bûn. Vêya bi xwe ziyar gîhand xebata çend kesên pispor ku di vî warî de dixebitîn, herweha reng e ziyarê bigihîne helwêsta xwendevanên Kurd û yên ne Kurd jî, renga nêrîne çewt li ser berhemdariya Kurdî ya nûjen pêk bîne.

Pêwîst e careke di ez li vir bidim xuyanîkirin, ku rola Hukûmeta Kurdistanê Iraqê di vî warî de dikare balkêş be. Lê em partiyên siyasî û komeleyên çandeyî li beşên dîtir ji berpirsiyariyê bi dîr naxînin, herweha li derveyî welêt jî, çînkî hemû partiyên guhdane çalakiyên siyasî û xebata rojane lê pîrsa keleporî digel ku pîrseke metirsiyane û jîndar e jî, di şer guhên xwe re avêtine.

Li vir, gerek em xebata hin hêzên siyasî yên Kurdistanî di vî warê keleporî de ji bîr nekin. Lê ez dixwazim ron û eşkere bibêjim: Hê em di destpêka rê de ne, berpirsiyariyên ku li ser milên me ne, mezîni in û pir mezîni in. West pêwîst e, xebatên rêzanî û zanistiyane û dirav pêwîst in.

Herweha zemîneke demokratî, rewan, bê helwestên zîbeqî û nêrînen xapandar.

Armanç: Çîrok, serpehatî û destanên Kurdî yên kevn, rabûn û rûniştina civata Kurdî ya kevnar, awayên tremandin û hişmendîya gelê Kurd; hetanî kîjan qonaxê bi gewde kirine? Piştî re ez dixwazim tu li ser nakokîya di navbera serpehatî û mîtolojiyayê de, eger

hebe, bipeyivî?

E. Seyda: Gelek lêkolînger, gelek xwendevanên normal yên ku guh didin van babetan, tevliheviyê dixînin navbera mîtolojiya û destan û çîrokên gelêrî û efsanê, lewra ez dixwazim hinekî ron û nîşan bikim. Mîtolojiya nêrîna li cîhanê ya mirovê kevnar e, li cîhanê bi herdu beşên wê; xurşî û civakî. Hewldana mirov ya pêşîn bi gewde dike, dema ku bi alîkariya wê (mîtolojî) dixwest kuE. Seyda: a pîrsên mezîni yên çarenûsane bide, ew pîrsên ku mirov seddîl dikirin wek: Gerdûn û mirov ji kû derê hatine, çiyetiya mirinê û mebest jê çî ye, girîngiya zanîne, pişeyên cihê reng ji kû derê dest pêkirine, qanûnên ku gerdûn û civatê bi rêxistin dikin, eger û sedemên şaristaniyê, mîtolojiya bi giştî xwe dispêre ser ramana hebûna du cîhanan:

1- Cîhana mîtafizîkî-nediyar ku kiryar (fail) û desthilatdar e. Di vî cîhanê de, hêzên xuristiyane yên mezîni bi nûneriya xwedanên cihê cihê, rolên serêkî dilîzin.

2- Cîhana berbiçav û berhest ku bi nisbetî cîhana pêşîn mijara kirariyê ye, lewra em dibînin ku di çarçewa mîtolojî de mirov bê rol e, hatiye afirandin da ku xizmeta xwedanan bike, xwedanên ku ew bi xwe serkêşîya bûyer û rûdanan dikin, biryaran werdigrin, çînkî mirov nikarin kûrahiya wan bizanibin, lewra mîtolojî ji çîroka gelêrî cihê ye. Çînkî çîroka gelêrî rola pêşîn dide mirov û wênaya leheng, ku mirov e û hêdî hêdî di bûyerên çîrokê de berz dibe, ji xwe re dike nimûnedariyê (wênaya leheng) û di çîrokên gelêrî de xwedanên ku hene, bi rola piştigiriya mirov radibin, lê bûyer her û her dunyayî-mirovî ne.

Herweha mîtolojî awira wê gelemper e, dîmenên wê bawerdar e, li ser çîrokeke evîni napeyive û ne jî li ser kareke qehremanî ku hin mirov li vir an li wir pê rabûne, herweha li nik şirovekirina rûdaneke xuristî ranaweste wek efsanê, lê awireke gelemper pêşkêş dike, ji alî guhdan û arezûya kuE. Seyda: a pîrsên bi çarenûsa mirov ve girêdayîne, bide, bêhtir nêzikahiyê li felsefê dike, pêdiviya zeyn hiş û bîra mirov pêk tîne. Renge mîtolojî xwe bis pêre bîngeheke dîrokî, lê wê bîngehê derbas dike ji ber wê tevliheviya alozî ya di navbera çend rad û sînoran de; hin pîskolojî û olî ne û hin jî civakî, aborî û siyasî ne.

Lê dastan, nêzikîrîn babetê bi nisbetî mîtolojiyayê; di gel ku, ji alî rola mirov, ya pir taybetmend (di destanê de) jê cihêwaze ji mîtolojî û regeza pevçûna dramatik jî di dastanê de wê ji mîtolojî hinekî cihê dike. Li vir dastana (Gilgamîş) ya Somarî wek nimûne tê destnîşankirin. Lê eger em bi hûrbîni li wan temaşe bikin, emê bibînin ku dastan jî wek mîtola li ser ramana hebûna du cîhanan ava dibe: Cîhana desthilat û kiryar û cîhana bîndest ku biryaran pêk tînin û xwedan her dîmenîni wek hêza kiryar ku lehengê mirovî, çî diyar be û çî jî bi awakî ne diyar bi rê ve dibin.

Ma ku em bîjin: Mîtolojîya xwe dispêre bawerdariyê, tiştên ku pêşkêş dike, wan, wek rastîyeke reha (mutleq) ku pêwîstî guftû-

Dûmahîk r. 11

JI GERNAMEYA MARCO POLO Li Asyayê

Wergêr ji Swêdî: Mihemed Dehsîwar

Ger ku xelqê bajêr havînan li vir ji ber germa bê hesab (52) -ku gelek zerar dide meriv- nesekinîni, ew diçin nav baxçeyên xwe yan diçin ber qeraxê avan û çeman. Xênîyên xwe li wirê ji leflekokê li ser avê çêdikin. Piştî dora wan xênîyan bi sing û kêranan digrin, aliyekî xênî li ber qeraxê avê û aliyê din jî datînin ser wan kêran û singên nav avê. Holikên wan ên ku ji pel û giyayê hatine çêkirinê, wana li hember tavê diparêze. Ew her roj berî ku neh seet ji êvarê re bimîne dema xwe li vir derbasdikin. Ji ber ku wan seetan bayekî germ û fetîsandî radibe ku meriv ji ber wê nikare nefesa xwe bistîne. Kesên ku xwe bidin pêşîya vî bayê, karin ji ber tesîra wî karin bifetîsin jî. Kîjan kesê ku di nav wan rastên bi sîlekan de derbasbibe û ew ba bi ser wî ve bigre, ew ji êşên xirab xilas nabe. Çaxê xelqê pê dihişse ku serê wê bayê derdikeve, ew xwe heta qirikê dixin nav avê û tê de dîmenîni heta ku ba disekine.

Ji ber ku Marco Polo jî dixwest wê germiyê bi xwe bibîne, demeke kin li vî heremê ma û di vî demê de ev bûyerên hanê qewimîn: Ji ber ku padîşahê Hurmîzê baca xwe ya qralê Kermanê nedabû, qral biryar da ku van diravan wextekî ku ew bi piranî li dervayî bajêr di man jî wan bistîne. Ewî jî nav leşkerê xwe 1600 serbazên siwarî û 5000 serbazên peyade di nav welatê Reobarlê de şîyand ku wana şaş bike. Lê leşkerê tevî rêberan jî rîya xwe şaş kirin û di wextê ku biryar dabûn de negihîştin cihê xwe. Leşkerê berî êvarê li deverêke ku ji Hurmîzê ne zaf dûr bû konax danîn. Piştî ku roja din dest bi meşa xwe kirin, ew bayê zor û hişk bi ser wan ve girt û tev ji ber wê xeniqîn. Yek hebek jî ji wan nefilîti ku wê bûyerê bigihînin serokê xwe. Dema ku xelqê Hurmîzê bi vî xeberê hişîyan, xwestin ku van laşan ji bo zêde bêhn nedin dora xwe veşêrin. Çaxê bi ser wan ve çûn, dîtin ku tava germ a weke agir laşên wan wisan xirakirîye ku çaxê meriv destê xwe diavêt ranên wan, ew di ber qorikên wan de bi destên meriv ve dikîşîyan. Ji ber wê yekê mecbûr man ku mezelen wan nêzi wî cihê ku lê miribûn bikolin û têxinê.

Ew keştîyên ku li Hurmîzê tîn çêkirin gelek xirab in û rêwingîtiya wan pir bi xeter e. Sebebê nebaşîya keştîyan jî wê tê ku ew tê de qet bismaran bikar nayînin. Darên wê pir hişk in, zû dişkên û beladibin. Ger meriv bixwaze bismarekî tê de rake, ew bismar tê de naçe lê bi piranî dişkê. Texte bi himmet, bi xişavên hesin heta nêzi dawî tîn qulkinê û texteyên din di wan qulan de tîn bicîhkirinê. Ew bi vî awayî bi êkdu ve tîn girêdanê. Piştî wê ew tîn girêdanê yan jî bi benekî ku ji qaçilê goza hindê hatiye çêkirinê tîn dirûtinê. Ev gelek mezin e û dora wî bi benekî wek porê qalind û zexm hatiye çeperkirin. Ev perçeyê ben an jî rîs di avê de dîmenîni heta ku perçeyên wê yên nerm xwe jê berdidin û benê dora wê bi rihetî jê dibe. Ew benê ku pê texteyên keştîyan tîn girêdan wiha tê çêkirin. Piştî ku dirûn an jî girêdana wan tewadibe, ew demek di bin avê de tê sekinandin. Ji bo ku binê keştîyan bê parastinê zift nayê bikaranîn, lê ji pêla wê ve ew bi donekî ku ji bezê masîyan çêdibe tê hesandin û piştî jî cawekî qalind pê ve tê zeliqandin. Tenê hebek darê dirêj, hebek cihê îdarekirinê (53) û qatekî tenê di keştîyan de hene. Çaxê barê keştîyan dihat barkirin, ew bar bi çerman dihatin veşartin û li ser wan çerman jî hespên ku dê biçûna Hindê dihatin bicîhkirin. Li vir frênên hesin nayên bikaranîn, lê haletên din tîn bikaranîn. Ji bo wê jî hingî ev derya bi bager e, di hewayên ne xweş de keştî bi piranî bi ber qeraxan ve tîn kişandinê û li ser erdê rûdînen.

Alema bajêr misilman in û rengê laşê wan tarî ye. Ew di adarê de genim, birinc û toximên din tovdikin û di çirîya pêşîn de radikin. Her wiha fêkî jî di vî mehê de tîn hilandin, lê xurme di gulanê de tîn danehevê. Xelqê virê van xurmeyan li nav hinek tiştên dinê dixin û jê şerabeke xweş çêdikin. Çaxê ku yekî jî wê şerabê nevxwaribe û cara pêşî wê vexwo, pir aciz û ne rihet dibe. Lê piştî ku ji êşa ewil derbasdibe û meriv hîni tama wê dibe, îdî tama şerabê xweş dibe û meriv ji vexwarina wê qelew dibe.

Xwarîna xelqê cihê cure cure ye. Ger wana goşt û nanê genim bixwarana, dê sihheta wan jî li gora wê bûna. Jiyana wan li ser xurme û masiyên şorikê, li ser masiyên deryayê, masiyên hişkkirî (54) û şiklên din ên ku ew zanin ji wan re bi fêde ye. Ji bilî cîhên avzêl, li ti cîhên vî welatî giya şîna nabe yan jî ew li ber tîrêja tavê û ji ber germê hişk dibe, dimre. Çaxê ku zilamekî mezîni dimre, jin çar heftîyan li ser hev rojê carekê bi dengê bilind digrîni û diqarînin. Li virê hinek meriv hene ku girîne jî xwe re kirine pişe û ji bo girîna xwe, ji xweyê mirî pere distînin. Tevî ku ew ne nas û pismamên wan in jî ji bo peran digrîni û qarîni dikin.

Têbînî:

52) Ev dem dikeve nava her sê mehên havînê, dema ku ba dest pê dike.

53) Li gorî zanistîyên ku tê gotin, keştîyên tenê bi cîhekî tê îdarekirinê wê demê gelek bûn lê yên dubare jî ne zêde xerîb bûn.

54) Li gorî Marsden Cepola tania.

Dûmahîk heye

Çand û wêje

Çîrok

Kewbazê kerr û dengvedana dijwar a bazinên taristanê

● **Ehmed Huseynî**

Tu li wir î, tu di helkehelka qonaxê de yî, tu di nav siberan de têt bişaftin. Dilo-pên xwîna te çavkaniyên qerisî sermest dikin, zemîn ji bi hêsrên te dinemiya, şil dibû, kul dibû, digiriya.

"Cûdî" li ber çavê te çav qerimî dixuya. Dihênijî û bi bawîşka te re dibawîşkî. Belg û guharên xwe dispartin pire-pira agirê nava xwe û dîrok diçelqiya, keştiya rîzyayî tofana te diqurmiçand û serê te bê paxil, berê te bê himbêz, diman... Lê te rehên mijê bi çarereşiya xwe dikutandin û tu bi serberzî; bi rizgarî, bi dengpêketin dişemetî nav avgerînkê konkê ramaan ley-lanî. Te dida dû hilma şevê, di şiverêyên mîna çarenûsê de tu hogirê çîrokên pezkûviyan dibû yî, vele-rizîna qamişê dihingivî çêregeha hişê te. Qenebe tu pêrgî demsalên berbad ên ciwanî û diltariya çiyân dibî. Wê gavê cerg û milakê hemû rû û rûbarên "Mezopotamya" têra axîn-kêşana te nedikirin.. Lê hêjî ji te ditirsim Bavê Tûjo ?!

-Nayê bîra min?

-Li paytexta tenhatî û berfê. Li koşeya gerdûn a ku bi tem û tariyê hatiye pesinandin a ku sextekaran dihêwirîne. Erê Bavê Tûjo, di nav wexma kelpîçên terikî û rengên kevzgirî de, li Stockholm a kevnar, li "Art Caffè" dema ku pêlên har û kelyayî ji singa te dipijiqîn û perravên

tembûra min ji xelmaşbûnê çeng dikirin. Ji tîna gazinên te dîwar germ dibin, disincirin, diqirçiyân û li sîtava bêdengi-ya me dihatin hev. Te sîmaq bi ser serê me reşand, te gula hîro ji bin zimanê xwe derdixist û şirkê simbilan ji devê te, bi ser bazbenda me de, dinuqutî. Pêre, welat, wek rondikine zelal, nêzîkî nehênîyên çavê me dibû. "Hendrên" li dûya cigara xwe temaşe dikir û ji te dipirsî: Ev çi toz e Bavê Tûjo?

Tu nedihedinî. Ji nişkêve, dilê te, wek çûkê baskokirî, li ser keviya masê bi raperandin, meşîya. Berga pirtûka Hêminî "Naley Cudayî" çar caran, nikuland û hêdî hêdî di kûrahiya xêz û beşavendan de hiliya.

Dîsa "Hendrên" ji te dipirsî: Ma dilê te xwe bi kude vedizî?

Firiya.....

Firiya.....

Firiya...

Te digot û tu jî di rivîna giriyê me de digiriya.

- Ji bo çi tu bînteng dibî Bavê Tûjo?!

- Ma hûn nabînin:

Ku çawan hişê xwe li xewna windayî radipelînim...

ku çawan miştaxa gundê xwe ji nav vê bixçika bi sed girêk derdixînim.

Ku çawan pênuşa malkambax ji halanê ber bi giryanê de dişînim..

Ku çawan hûn li van deveran bê xwedî man.

Ku çawan li vê jîne bê jîyan em jîyan?

Rewrewk

Fethulla Huseynî

Tîrêjên roka sibehê
bîna te kirbana
bi roj-bixêrê re
nedihatî!

Keske-sorên bilind
piştî xunavê
rewşa te dîtibana
hilnedihatîn...!

Û tenê..

bê weran bihîstibana
bejna te heyî...î
ne digotin:
em bê welat in
Lê çibikim,
tu ley-lanî..

**Ne xemkêş im
Kamiran Bêkes**

Dilê min
va ye bi nav dibe
di çavên te yên şîn de;
di Urmiya û Wanê de.
Babirkên wî çirandine
bahozekî
ji awirên te, ku birêketî.

Li ser sînga pêlan; latan
xewdikim
kenê te, ku bixewnînim.
Xewn tenê xewn e,
evîn jî- jan, êş, keser!

Dibêjin min
ku bi sitirî ye rêça dilê te,
xwekuştin e hezkirina ji te...

Ez ne xemgîr im, bimrim
li ser sîpanekî wendayî;
lew zindîyê dixwazim.

Xwedê jî carekê mir:
Dilovanîya wî
evîna wî ji xelkê re
Ew kuştîye!

Di têrê de

● **Husên Hebeş**

Ne dengê zirnê û ne jî gurmîna daholê di bîra min de mane, tenê meta Zîz du destmalên biçûk kiribûn nav destên xwe û li gel çend jinan çûn pêşîya bûkê, ew hildipekîn, xasma meta min, loma kurê wê yê mezin dibe xwedî jin û wek li cem me dibêjin ew ê "bisitirê". Dengê lîliyan bilind dibû dema keça qerebabayî ket devê hewşa Bilîkê.

Em biçûk bûn; du zaroyên heşt-neh salî bûn. Ez Îbo û Misto kurê meta min bû. Di rojine zivistanî sert de em jî gundê Çaqmaqê biçûk bi mezinan re birêketin û di devberjêr û devberjorên nas-

dikin û dikevin bin emrê xwedê, divê vexwendî, mîvan û sêrkerên gundên din biçin, çimkî ji wan re kêmanîyeke mezin e, eger ew li wir bimînin û kî xwe şaş bike û çiqas sedem dabîni be jî û wê şevê li wir bimîne ew ê li ser lêv û di nav devên xelkê de bigere û li cimaetan dê tinaziyan pê bikin, loma eger kevir jî bibarin divê xatirê xwe bixwazin û "bi hev re kal û pîrbûnê" ji bûkê û zavê re hêvbikin.

Da ku tu leke li mezinên me, xalanên zavê nekevin û ew nebîne xwedî kurkine zivistanî, êvarekî em birêketin... Çi êvar!! Û çawa bi wî alî de, bayekî kurbayî sar, ji kêrê tûjtir li rûyê me û govdê me

xetimibûn, kort û çal xavê nedihatî, havînan di şiverêyên weha re çûyin zehmet e, vêca di êvareke weha seqemîn û berfîn de wê çawa be!!

Bi dijwarî çend mîtroiyên rê me birrîn, ji ber selametiya zarokan û jinan Apê Reşo xwest rêyeke nêzîk bibîne, ji gundê Halîlê nêzîktir û rêdûztir Hucemala ye, loma wî got: Mêr bila herin mal û ezê qîçkan û jinan bi Hucemala gîhnim.

Eger hêştir "keştiya kerbelanê" ye, bêguman qantir jî "cîba çiya"ye. Cîba çiyayî bi rê ve vedipekî, Reşo, şofêrê wê tewazina xwe wenda dikir û ji nişkêve Xeco ji ser piştê ket xwarê û tulqizî li ser berfê û keviran vedidan û nifir ji devê wê derdiketin:

Sed lahnet li Bilîkê û daweta wî bê ma nikaribû ew quzilqurta di payîzê de bikira.

Reşo ew bi çi halî siwar kir; lingên wê li serê min û Misto diketin. Em her yek di aliyekî têrê de bûn, carna gava qantir ta kaban diket nav berfê, em li erdê diketin. Em ji serman tevîzibûn, lê em bi wê jî ne dihesiyan, lê gava qantir rastî kortên mezin dihat em tê de diçelqîn. Ax û kufîna Reşo û nifirên Xeco li nêzîkî Bîra Hebelankê hatin birrîn, hîn hemû çirên malên Hucemala venemiribûn, bîhna duyên pixêriyan dihat, ewt-ewta

kûçikan jî nehatibû birrîn. Hêz û taqeta Reşo nemabû, ew hema bi zorê dilivî, ji guvîna bayê biçetîni lêvên wî ji hev vedibûn û bi dengê qerimî bang kir:

-Bila yekî babegît were, yekî babegît, em di berfê de çûne xwarê, em çogmîş bûne.

Demek dirêj di ser hawara Reşo re ne buhurî, xirtîni bi deriyekî ket û dengê ji aliyê gund ve hat:

-Ez î tîm, ez î tîm.

Bi bêr û tekê ve Tecalê Elîkê yê "babegît" bi ser me de hat. Hefsarê qantirê kir destê xwe, em li ber mala xwe peya kirin, çawa têra tijî zebeş datînin em jî wer bêdeng û bêlîvî danîn û ji nav têrê derxistin. Me nikaribû xwe li ser lingan bigirta, hema çawa lêhat wer me xwe dirêj kir. Teştêk ji me re anîn, dest û lingên me kirin nav ava sar, çimkî nabê tavilê wan bi berêgir din.

Me nikanî tiliyên xwe ji hev vekirina, destên me bûbûn topaçên berfê, em ji ber şewatê dinaliyan; di ber nalînên me re teqîna fişekê zavê bi ser me de hat.



kirî re li gundê Halîlê peyabûn.

Piştî zava fişekên xwe li ser xênî avêtin û şiqirtiya wan di nav ewrên nêzîk da wenda dibûn, perene hwîr bi ser bûkê de weşandin û bi wî rengî pêşwazî lê kirin, ew jî piştî mehîne danediket; ew wer bi asanî peyanabin. Li gor adetên kurdan divê ew bêne razîkirin. Perçak erd, çend darên zeytûnan, deh panzde mêmên tiriyê Bêçî Xatona, yan çend pezan pêşkêşî wê dikin, ew li gor halê mala zavê dimîne; ew dagirtî ye ya na?. Pist-pista pîrejinan vê re dihat "danûstandin" pê re dikirin, ew peya kirin û birin hundirê yekqentirmeyî yê nîzim.

Berî mehra zavê û bûkê bibirin û zave here ba bûkê, yan herdu di paş perde kevin; di yekxaniyan de odeyên xweser tune ne, loma di quncikekî malê de perdeyekê vedidin û ta hefteyekê ew di wê sitareyê de kêfa xwe

diket, ew diçelqandin, me çiqas xwe diqulîland hevdu em germ nedibûn, cilên me tenik û ne zivistanî bûn, kesên li wir desteng bûn, nikaribûn cilên estûr bi destxistana.

Zivistanan hawîrdor zû tarî dibe, morantiyê erd girtibû, qiristan meyî bû, tirs ji yên çê û neçê dikeve dilê mirovan, cinawir xedar in, şev şahîstana wana ye; ji nav pozên çiyayên nêzîk lûrîna wan dihat, me hemûyan ew gefana dibihîstin û em ditirsiyan, rihspiyê me Apê Reşo di cih de hefsarê qantirê hişk girt, em sekinandin, berbi hevrêwiyan nêrî û got: Ez ditirsim wek Xelê Hênin li me were.

Çîroka Xelê Hênin û şerê wî bi guran re li wê derê her kesî dizanî; berî bi salekê li kaşê Hebelankê, bi şev guran êriş biribûn ser wî, ew birindar kiribûn, bi fişekê çifta xwe yê paşin wî karibû xwe ji nav pencên wan rizgar bikira. Berf nû sekinibû, rêkork

□

Spehîtiya Xwendinê

● Tengezarê Marîni

Bê guman; dema xwêner dixwaze li ser mijarekî mîna xwendinê û ciwaniya wê binivîse, ew ê giraniyeke wî mijarî li nik hebe. Helbet ewê ev giranî ne ji xwe ve hatibe.

Xwendin ne tenê rexnegirtin li ser rexne ye, lê bedewiyeke wê jî heye. Spehîtiyeke taybet e, dema xwêner wê ciwaniyê wînda dike, tu buha, tu pêwîstî ji xwendinê re namîne. Li vê derê çî berze dibe?

Wek ku bedewiya danê (nivîsîn) heye, ciwaniya wergirtinê "xwendinê" jî ne kêmtir jê ye.

Em ê çawa li heyberê rexne bigrin, ango çawa tê xwendin? DiE. Seyda:ê de, ew ê helbest nimûne be. Xwêner ê heyberê pêşberî xwe deyne, berî danîne serê wî mişt e ji hizir û ramanan. Ev jî ji tîkiliyên wî yên civakî, konevanî, eborî, sincî, dirûmî..tên.

Nivîsîn bi xwe "cîgehê cenga hunerî / îdeolojî ye" Ev ceng û tîkilî wê bandora xwe li xwêner bikin.

Dema ev xwendin bighe radeyekê ku xwêner elementên derve di ser yê hundir re bigre, hinga mîrmeşîneke rewşenbîrî ji xwe re ava dike û kelepe û xêzerana ji xwe re peyda dike. Û dema di xwendina xwe ji heyber e, zû bi zû tê negihîşt hînga "Gayê pîr te çî xwariye"

Ev xwendin kesîti ye, ne ya heyber e.

Ango ev xwendina bîranîna ye, xwendina gencîna û îambar a rewşenbîrî ya xwênerê. Û eger ew mijûliyên di hişê xwêner de pêk nehatin, hinga ew nivîsîn, ne resene, pîvanên civakî û sincî diherifîne.

Li vê derê em pîrsekê dikin: Ev çî pîvan in, yên di her cih û demî de yek bin? Ger pîvan bi vî rengî bin, em derveyî mêjoyê dijîn, ango em bê livin..!?

Xwendineke wisa bi vî tonî li heyber, pîrsan beravêti dike, dînamîkiya heyber xulûxavî dike. Ev ne xwendina heyber e, lê suxurandina wî ye, bin ax kirina wî

ye. Çawa ev stûn wê biheje? Çawa em ê xwe tîxin hundirê mêjoyê?

Bi guherandina şeweyê heyber ((tekst)), metodekî nû diafire, derbirînen nû bi giyan dibin, ciwaniyeke nû li dar dikeve û xwe ji qeyd û pîvanên ciwanî û hunerî yên berê azad dike. Ji ber vê jî xwendinek jîwaz, pîvanên jîwaz û spehîtiyeke nû ji heyber re divê.

Ev xwendin regezên nebeşdar beşdar dike. Ev xwendin gerdûnekî nû ji pîrsan dadimezirîne. Xwendina nû hogirê heyber di geşt û seyrana wî de ye, ew seyrana ku armanca wê;

"1-Nasîna rêça bikaranîna zimên e.

2-Nasîna rêça zanîn û guhertinê ye.

3-Nasîna buhayê heyber yê zanînî ye.

4-Nasîna dîrêhê bedewî yên heyber" e

Ev rade ji xwendinê problêmeke mezin ji hev dixwe. Ev problêma ku tim cudabûnê dixwe navbera nivîskar û xwêner, xwendina jorîn diwarê di navbera cemawer û helbestvan de diherifîne.

Babet ne di nêva nivîskar û cemawer de ye. Mesele gelo ma ev helbest "baş e yan ne baş e"?

Pîr "xwêner hene heyberan tevan bi yek tayî tajon. Her heyberêkî xwênerê xwe diafirîne, zimaneke wî heye pêwendiyên wî hene, pîrsên bi xwe taybet dadimezirîne. Ew xwendina ku hemû heyberan bi rengê tenê dixwîne, heyber mîna dakumentekî, bo çareserkirina berjewendiyên, dibîne. Xwênerên wîlo xwe gaweke nêzikî helbestê nakin, dixwazin ku heyber bi meywe be, lê ew rûniştî mîna "tiralê Bexdayê" bin, ji xwe re meywe têkeve devê wan. Ev jî alîkî ve û ji aliyê din ve, xwêner xwe "Kamil mikemmel" dibîne, ango xwe dibîne ku ew ronakbîrî himbêz kiriye û eger baweriyên xwe di heyber de nebîne, heyber... Xwendina wîlo bo pêkanîna "hacetên kesîti ye nexwendina yên din e"4

Xwendina xwe berdide hinavê

heyber û asoyên pîrsan tîne zimên, ciwaniyeke wê bilind heye. Buhayê helbestê di dînamîkiya wê de ye. Şêya helbestê pîr e, dema bi her xwendinê re li ser dergehê amajeyan vebe û wî zimanê himbêz bizivîrîne vegezinên wî yên rewşenbîrî û wate û amajeyên bi xwendinê damezirîne, bi gewde bike û ji xwendineke nû re amade bike.

"Xwendin: Bergehê rageyandina di nêv berhemên nivîsî û xwendina xwêner ji wan re ye."5

Heyberê dahênanî projeye, xwêner bi xwe pê re hevpare xwendin û nivîsîn herdu projeyên amajeyî ne.

Dan û stendina xwêner bi nivîsînê re dighe qûnaxa livîna dîrokî û heyber "di rîya sîmbolan ve tê xwendin û pîrs li pîrsan dipirse û asoyên xwe ji dan û stendinê din vekirî dihêle.

Di dawî de çend pîrsên bê bersiv di guhên me de zimmênîyê dikin, em ê wan guhêzin li ser kaxezê û hêvdar im ku bibe projek ji dan û stendinê re, da ku em nêzik û dûrî hev bikevin, lê di dawî de axaftineke rewşenbîrî di vê kurte bêjê de "Her tişt ji bo dan û stendinê" damezirînin.

1-Em ê çawa xwe ji bin barê axaftina girî "pîroz" azad bikin?

2-Em ê çawa axaftina xwe ya rewşenbîrî bigihînin radeya diyalogî ya hemî dad û pîvanên berê biroxiyê û li ser bîngeheke nû pîrsan biçîne?

3-Gelo em ê karibin meteloka Kurdî ya dibêje: "Her cem yê te bigriyênê, ne yê te bikenîne" di xwe de berçeste bikin?

Me bêjeyên (spehîtayî-Ciwanî û Bedewî) bi wateyekê bi karanîne

- 1-Adonîs - Siyaset El şîr - dar El-Adab, r.:50 Çapa 1 -1985 Beyrût
- 2-Ew Makder bixwe Adonîs r. 55
- 3-Adonîs Makder bixwe Rûp: 55
- 4-Adonîs Makder bixwe Rûp: 58
- 5-Kovara-El fikire 1 erebî El mû'asir ji - 98-99-r:95

Sabir Çelebî

● Bavê Bazo

Piştî gundiye Barinê paleya xwe dikirin û sapê xwe tanîne ser bêndera cercer dikirin didêran. Hawêrî dora gund dibû komê genimê sor û ceh, nîsk. Sabir Çelebî Barinê bi navê jina xwe Sînem xatûn nivîsandibû lewra ew memûrê tapowa bajar û hêla Mardînê bû di dema Osmanî de. Sabir Çelebî her kurekî xwe jî gundek bi navê wî tapo kiribû. Her sal serê havînê zîlamê xwe dişandin hox û tîcîkê gundiya xûm dikrin û dûvre zîlamê xwe dişandin cêzê genim û ceh û nîska şeqil dikirin. Ta ku kes nikaribe para Çelebî bixwe. Sînem xatûn û Sabir Çelebî hînî gundê Barinê bibûn her havîn li qantira xwe siwar dibûn dihatin qûnaxa xwe ya li gund avakirî. Gundiya bi rûmet li wan dinerîn, doşek û zemberîş ji wan re tanîn. Sibeha qeymax û nivîşk bi hinguv re dixwarin, nîro firavînê, goştê berxa dixwarin, êvarî şivê, goştê qaza û mirîşka û mehîra cemidî pîre dixwarin. Êvara civata wan digeriya pêşkêşên gund dihatin. Şev buhêrka wan ji wan re tenazî û pêkenok digotin. Çend rojê bi delalî û şahî dibûrandin para xwe ji hatina zada distendin vedigeriya bajarê Mêrdînê.

Sala 1916 Ereba şoreşa mezin rakirin Firansa sînorê navbera Sûrî û dewleta Osmanî danî û li welayeta Mêrdînê bûye hesinê trêne ya ku Eleman çêkiribûn bi navê tirêna Berlîn- Baxdad. Başûrê hesinê tirêne kete bin destê Firansa bi alîkariya hinek leşkerê Ereba, lewra Sûrya bûye parêzgeha Firansa.

Gundê Barinê bûye para qada Ereba. Boyî vê yekê Sabir Çelebî her sal bi tenê dihatê gund para xwe ji hatina zada dibir. Sal bi sal rûmeta Sabir Çelebî kêmtir dibû ta hineka para wî nedidanê. Bîlî

oldara, digotin, raste qad qada Xwedê ye lê piştê qada Sînem xatûnê ye û heger hikûmet jî bêje ev qad ji were em bi xwe nagirin. Sabir Çelebî havînî dihatê nema dora xwarina xweş dikir çend rojêkê dima derdê wî ku çend qurûşa çûr bike. Ji xwêre digot her çûye hema mûyek ji teriya Berêze. Demek hat xelk şiyar bûn, çavê wan vebûn naskirin ku çî guhertin çêbûye li cihanê îcar her ku Sabir Çelebî dihatê gund, gundiya tenazî pê dikirin digotin wey vaye Sabirko hatiye lawo. Sînor sal bi sal pirtir dihatê parastin ta ku xwedan gund û qad divêbûn ku paswana ji her dû dewleta bistûnin. Boyî vê yekê Sînem xatûn havînê dihatê Barinê. Tiştê ku gundiya didanêde digirt û gele-



ka digotin de hema pîreke ji dûr ve tê, emê hinekî ji hatina gund bidinê de yek cara Sînem xatûn Sabir Çelebî bi xwêre tanî. Gundiya lagirdî pîre dikirin û ji xatûn re digotin. Seburo viro çima bi xwe re tîne. Gundiya ji hevve gotin ev kes nema ne bi wan sardibe û ne bi wan germ dibe çî koranî bi çavê mede hatiye em keda xwe didine wan. Gundiya yekî rûşûştî şandin cem wan ji wan re got: Xaleta Sînemkê xalê Seburo tiro bi Xwedê nanê we li vî gundî nema û nema werin. Kes nema quroşekî bi qul dide we. Çelebî ji xatûnê re got: Da em herin beriya ku bi navê te jî bileyizin. □

Weşanên JÎNA NÛ

Abdurehman Qasimlo (Dr.); Kurdistan û Kurd-Lêkolînek Siyasî û Aborî-, Adonîs Budurîs; Bir Kürtle Konuşma... (şiir), Bavê Nazê; Hêsir û Baran (çîrok), Celîlê Celîl (Dr.); Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan (Di Dawîya Sedsala 19'a û Destpêka Sedsala 20'a de), Celîlê Celîl (Dr.); Zargotina Kurdên Suriyê, Celîlê Celîl (Dr.); 1880 Kürt Ayaklanması, Ebdulreqîb Yûsif; Şairên Klasik ên Kurd Ebdulreqîb Yûsif; Hunerê Tabloyên Şerefnamê Ehmed Huseynî; Rono û sirûdên bîrîkirinê Ehmed Huseynî; Bi Xewna We Pênûsê Dilorînîm H. M. Çetoev; Büyük Anayurt Savaşında Kürtler Haydar Diljen; Destpêka Rêzimana Kurdî Haydar Diljen; Zimanê Min-1 (Em bibirin-bizeliqînî-binivîsîn û bixwînin) Kerîmî Husamî; Komara Demokratik a Kurdistan (Mahabad) Kerîmî Husamî; Le Bîreweriyekanim Koyo Berz; Na xumxuma...(Dimilî) M. A. Hasretyan (Prof.) - K. M. Ahmed (Dr.) - M. Ciwan; 1925 Kürt Ayaklanması (Şeyh Saîr Hareketi) M. A. Hasretyan, C. Celîl, O. İ. Jegalina, M. S. Lazarev, Ş. X. Mihoyan; Yeni ve yakın Çağda Kürt Hareketi M. Ahmedê Namî; Agirê Sînema Amûdê, Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî; Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojna

megeriya Kurdî (1908-1981), Malmîsanîj; Herakleitos (şîr bi Dimilî), Malmîsanîj; Saîd-î Nursî ve Kürt Sorunu, Malmîsanîj; Yüzyılımız Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, Malmîsanîj; Zazaca-Türkçe Sözlük/Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Malmîsanîj; Folklorê Ma Ra Çend Numûney, Mamoste [Abdurrahman Gezgîn]; Dengê Xêzikan (karîkatur), Mamoste; Mêr Mêra Nasdike!, (karîkatur) Mûrad Ciwan; Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi - Kurmanc Lehçesi-, Roja Nû; 1943-1946 Kamûran Alî Bedirxan Ronahî; 1942-1945 Celadet Alî Bedirxan Şakirê X. Mihoyan (Prof.); İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kürt Sorunu Şêx Abdurrehmanê Axtepî; Diwana Rûhî, Şêx Mihemed Kerbelâ; Mîrsad-ul Etfal (Amadegaha Zarûkan), Şuayib Adlî; Hommage a Yılmaz Güney - Image du Kurdistan de Turquie- (foto album) Zekî Seyda; Tîr di nivê kezêbê de (helbest),

% 50' î erzanî ji wan kesên ku herî hindik 5 kitêban bikirin!

Navnîşana xwestinê

Jina Nû
Box: 152 16
161 15 Bromma-SWEDEN
Tel: 8-803135
Faks - 801825

ŞEWÊ LACÎ QÊYSERÎ

Arêkerdax: Seyîtxan KURIJ

Demêk Kurdîstani di yo qêyser û lacî xwi bînî. Lacî qêyserî rojêk xêlîyek devûn çî bar kenû û çend merdimûn xwi zi nûn xwi het a, hêt welat cuar (serhed) a şinû. Yî hunî riye d'ê, yo şew (şow) 'ecayîb benû puk, benû xezeb. Qêyser kîye di xwi bi xwi vûnû wêrîkna lacî mi aqîl bikêrdiyên a devaya gird sara bibir-naynî û zerrê piyestê yay kotiyen.

Lacî qêyserî zi ser yo ko ya mendû, wi û umbaz xwi mijûl benî ki yo çarê xelîsiyayîşî vîni. Yîn ra yo vûnû:

-Ma a devaya gird sara bibirni û zerrê yay kwîr, ma ançax o qêde bixelis.

Yî ûnî a deva sara birnênî û kwenî zerrê piyestê yay. Serdî ver, wuşkay ver piyeste yenû piye, qurmiçiyenû; yî a şew tê sitar benî. Sêrsibay tij kwena a, benû nerma, piyeste yawaş yawaş verra diyenû, yî tira vécîyenî. Lacî qêyserî û çend umbazî yî xelîsiyenî la karwûn piyer qir benû.

Lacî qêyserî şinû kê xwi. Di cinî yi estî: Yo dedkênay (kênay apî) yi ya, a bîn xerîb a. A şewa ki wi koy ser o mûnenû cinîya yiya xerîb le-

hêf ûncena xwi sare, kwena (rakwena). Dedkênay yi hetûn sêrsibay nikwena; şina teber, yena zerre. A şewi zi hetûn sêrsibay hot duerim biyû paka, hot duerim biyû hora.

Lacî qêyserî ki şinû kê xwi, ciniya xwiya xerîb ra persenû:

-Tu aya şew çî dî çî nidî?

Ya vûna: -Mi taway nidî. Şûn di binekî puk bi la bacê ez kota. Ez sêrsibay wirişta ki weşî ya.

Wi kênay apî xwi ra persenû: -Tu aya şew çî dî çî nidî?

Ya vûna: -Aya şew hetûn sêrsibay hot ray hawa bi hora, hot ray bi paka.

Lacî qêyserî vûnû: -Ti dedkênay min a, zerrê tu mi vêşena. Ti şew semedî min a nikota, ayay ra ti zûna ki hawa hot ray bi paka, hot ray bi hora. A ciniya mina bîn xerîb a, ez umîrî yay di niya, ayay ra yay lehêf ûnt xwi û kote; nizûna a şew hawa sinîn bi.

Wi ûnû a cinîya xerîb ver denû û wi û keynay apî xwi pîya cuye (heyat) viyarnenî.

SANIKA HÊŞ

Arêkerdax: TEKO

Waxtê de piyayeda zaf dewletî beno. Mal û dewarê dêy hênî zaf beno ke new-dês kesî zor anê-benê.

Amnanî paya verdano vasa, pancas şeyştî berde vas çînenê. Zimistanî des danga verdano ra. Lewê dêy de çar citê gameşî, des medegî, des û ponc mozikî, çar ostorê xo ki benê.

Qaytkerdena mal û dewarê dêy nê rind êna ca. Zeke belekî kunê hard, gul û new-rojî vecînê. Mal danga ra xeleşîno ra. Dewletî xo rê şuwanan cêno, keno malê xo ver. Doşenayêna malî vîst berdestîye kena.

Şuwane û gawan, mal û dewarî ko be ko, deyşte be deyşte çiraynenê. Waxtê mal perçayêna êno. Dewletî poncas quşicî keno wertê malî.

Ayê de durî ra feqîrê ase-no. Dewletî fam keno ke feqîr sava pirçî ra yêno. Xo keno binê peşma pirçî û quşicîya ra vano:

-Piyawo ke yêno, eke pers kerd, vacê "Kes îta çina".

Feqîr yêno lewê quşicîya û ci ra vano:

-Bereket te de bo, axayê şima kotî ro?

Feqîr fam keno ke dewletî xo kerdo binê peşma pirçî. Feqîr rayşt şono lewê peşma ke axa bine der o. Wişîra xo keno berz dano piro, tey vano:

-Gewro ha gewro!

O waxt dewletî beno heş û remeno. Mal û dewarê dêy dewe rê maneno*.

Berlin

*Dengê Komkar (Kovara Federe-rasyona Komelên Karkerên Kurdistan Li Elmanya Federal), Frankfurt, no: 44 (15. 8. 1982), s. 11

ci ra: ti ra
çiraynayêne: çirênayîş, çiraynayîş

der: de, di, dir
dewletî: pêt, zengîn
deyşte: deşte, deştî
dêy: ci, yê, jey

êno: yeno
hênî: hendi, ehendi, endi, indi, hen

îta: tiya, ewta, owta, inca
kotî ro: kotî yo, kura wo, ça wo?

lewe: hetî
mozik: heywano ki golikey newe qedênaya, golikî ra pîlêr o

ostor: estor, istor
pîya: peye, camêrd

qayt kerdene: weye kerdiş, wêyî kerdene, qayit kerdene, qayta kerdiş, miqayt kerdiş

quşicî: qesnayox
rayşt: rast, raşt

sava: seba, semedê
şuwane: şane

vas: vaş
wişîre: uşîre, şewti, şeyti;

çiwa
xeleşiyayine: xeleşiyayêne, xelîsiyayîş, fîlîtiyayîş, reyayîş

FERHENGEKÊ
KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ-IV

Malmîsanij

Kirdkî (Zazakî)

dame, dami, tor
dara tuy, tuyeri, tuveri
dare, dari
darên, darîn
darû, derman
denne
derd
derg
derman
des
dest
destarî, distarî
deste
deşte, deştî
dew-e, dew-i
dêki, dêke
dês
dês kerdiş, dês viraştîş
dêv, dêb, dêw
dêvan da, dêban da
dije
dirreyîş, dirrateyî
dirmayêne, dirmayîş
dirmayox
di serre
diyini
dizd, duzd, tiritox, tirawitox
dizdî, dizdiye, dizdey, duzdî
dizi
diznaye, tirawite, tirite
diznayîş, tirawitiş, tiritene
dîn
diyayine, diyayêne, diyayîş
diwan
do, dû
dosera, dosere ra, cûserra
dost
dostî, dostey
doş-i
dowl, dewl
dowlik, dewlik, dulik, dolçe
duma, dima
duşmen, dişmen
duşmenî, dişmenîye
dû, duy, dûman
ditene, dutîş
dûrî, durî
dûrî, durey

Pehlewî (1)

dam (2)
tûtbun
dar
darên
darûk
dîg
derd
diraz, draj, direng, degr
derman
deh
dast, dest
asyayê pat dest
destek
deşt
dêh, dyeh
dayek
dîvar, dêvar, perçîn
dêzîten
dêv
dêvan-dat
jûzek, zûzek
drinişn
derîten, derrîten, driten
drîtar
do salek
dovên
dûzd, dûzt, duz, truftar
duztîh, dûzîh
diz, dêz, dês, dêj
dûzîtek, traft, teruftek, truften
duztîten, dûzîten, truften
dên
dîten
dipiwan (3)
mast zetek
doisr
dost, doştî
dostîh
pîl, girmilk
dol, dûl, dûlek, dorek
dûlek, dorek
dumb, dum (4)
duşmenişn (5), duşmen
duşmeniş, duşmenatîh
dût (6)
dotin, duwîtin, dwîtin, doşîn
dûr
dûrîh

Kurmanckî

dav, daf, dafik, torr
darû, dara tuyê
dar
darîn
derman, darû
cûreyeke beroşa mezin
derd
dirêj
derman
deh
dest
destar, distar
destik
deşt
gund, dih
dayîn
dîwar
dîwar lêkirin
dêv, dêw
dêvan da
jûjî, jojî, jîjo, jîjk
dirrîn
dirrandin
yê ku didirrine
du salî
yê/ya diduyan, duyem
diz
dizi
diz
yê/ya ku hatiye dizin
dizîn
dîn
dîtin
diwan
dew
hilatina rojê
dost
dostî
pîl, girmilk
dol
dolçe
dumahî, dîmahî, dûmahîk
dujmin, dijmin
dujminî, dijminahî
dû, dûman, dûxan
dotin, dwîtin, doşîn
dûr
dûrî

- (1) Kelîmeyê Pehlewîyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlevî
(2) **dam**: Pehlewî di yena me'na "torr".
(3) **dipiwan**: Pehlewî di yena me'na "cayê pawitişê (muhafezekerdişê) nuştayan".
(4) **dumb/dum**: Pehlewî di yena me'na "peynî, nihayet".
(5) Pehlewî di "**duş**": xirab, "**menişn**": fikr o "Duşmenişn" yeno me'na "fikrê xirabî".
(6) **dût**: Pehlewî di yeno me'na "buxî" (Tirkî de "buhar").

XÛNÊ HECÎ

De gidî gidî, de gidî gidî, Xûnê Hecî
Çim tu sîyay, burîyê tu qic î

Xûnê Hecî gulbarek a
Şew donûn a, rwej îlek a
Dêst Xûn bigir hêt merex a

De gidî gidî, de gidî gidî, Xûnê Hecî
Çim tu sîyay, burîyê tu qic î

Hec vûn Xûnê mi naşî ya
Mî Xûn niya, cergbaşî ya
Cerg gureta kwe ra şîya

De gidî gidî, de gidî gidî, Xûnê Hecî
Çim tu sîyay, burîyê tu qic î

Sêr bûn Hecî yo meydûn o
În meydûnî astuwarûn o
Rîza Beg mayîn kay dûno

De gidî gidî, de gidî gidî, Xûnê Hecî
Çim tu sîyay, burîyê tu qic î

Say sayerê dowê ma ya
Mî niyêwerda niyêtûmnaya
Teres bego, tu qey kuwaya?

De gidî gidî, de gidî gidî, Xûnê Hecî
Çim tu sîyay, burîyê tu qic î

*Îna deyîri veyvûn di yena vatîş. Mî yew dewa Çewlîg (Bingol) ra day arîye

Arêkerdax: Seyîtxan KURIJ

Partî ji bo çi tîn danîn?

●Bareş Betê

Li welatê ku serxwebûn û demokrasî tunebe gelê wî welatî nexwende û neşehreza be danîna partiyên siyasî û xebata wan birêve birin gelekî zehmete. Kesê ku van partiyên di deynin divê ji wî gelê ne şehrâza û xwende bi gelekî şehrâzîr û xwendevantir be divê ji gelê xwe re rêberiyek gelek bi rêkûpêk bikaribe bike. Divê nekeve nava leystikê dijminê xwe û bi wî awayî ji, zilm û zora ser gelê xwe mezintir û girantir neke.

Partî tîn danin ji bo ku daxwaz û pêwistiyan gelekî milletekî baştir û xweştir bidin xuyakirin. Li gor prensîpên demokrasî jî divê ji nava gel bixwe were meydanê û neku li dijî daxwaza gel û ji derveyî welatê wan werin danîn, neku wek peydabûna pêxember û olên wan ji ezmanên bilind werin jêr. Heger armanc azadiya welatê û gelê wî welatî be divê ev partî bêne danîn ji bo vî armancê pêk bîne û ne ji bo ku çend kes yan jî partiyek weha dixwaze.

Di tu demokrasîyan de tu partî û grup bi zorê nikarin tiştekî ku miletek yan ji kesek nexwaze, pê bidin kirin û qebûlkirin. Ew êdî daxwaza wan kes û partiyên bi xwe ye, neku ya wî gelî û wî welatî ye. Hingî partî dibin şirketên menfeetê kesên hevalbendên xwe bi xwe. Ew kes di nava partiyekê de ji xwe re cihêkî menfeet peydekirinê dibînin û bi navê partî, serxwebûn, azadî, ji gelê xwe bi zorê xugiyê distînin, gelê ku dixwaze ji koledariya dijmin xwe azad bike ji nûve dikeve binê koledariyek hê mezintir û girantir. Êdî azadî û serxwebûn dibe ya van partiyên û hevalbendên wan, daxwaza welatî û gelî li ber lingan diçe.

Awa bi xwe ji awayê eşirtiya berê jî hê li paştir e û xeraptir e. Wek nimûne rejîma ku bi navê îslamê hat dewleta îranê û îro hukmekî hezar sal kevn û paşverû dimeşîne. Gelê îranê îro li şahitiyê poşman buye lê êdî dereng e.

Di roja îro de rewşa Kurdistan û hinek partiyên Kurdistani yê ku hindik yan jî gelek kar û xebata xwe bi yarmetiya dewletek dagirkerê Kurdistan ve dimeşîne ber bi aliyê xerabiyê ve diçe. Perçeyên Kurdistanê roj bi roj bi xurtbûna van partiyên ne serbixwe re kêmîr dibin. Neke ew van perçan azad dikin, na ew wan perçan û gelê Kurd yê van herêman êşkere yan jî bi peymanên nehênî ku di navbera partî û ew dewleta dagirker de heya hîbeyî wan dewletan kirin. Bigotîneke din hebûna gelê Kurd li hinek beşên din yê Kurdistanê ji aliyê wan partiyên ku xwedî pêxember in ve hatiye înkarkirin. Hinek dibêjin, mesela Kurd û Kurdistanê di nava sînorê dewleta Sûriye de tune. Hinekê din dibêjin mesela Kurd yan jî axa Kurdistan di nava sînorê dewleta îranê de tune. Hinek jî dibêjin ku li Ermenistanê Kurd hene lê axa Kurdistan nagihê nava sînorê Ermenistanê. Wê hinek sibe bêjin ku tu derdê Kurdan bi dewleta Iraq û Turkiye ve jî tune. Ev tiştên han îro gelekî rojane nin. Hinek serokê hinek Partiyên heta ku şewra xwe bi van dewletan nekin ji bo gelê Kurd tu tiştekî nakin. Yê ku ji partiyên wan bi cesaret ve çewtiya han didin xuyakirin tîn kuştin yan jî ji partiyê tîn dîrxistin.

Bala xwe baş bidin vî ecêbê, gelê Kurd bi xwe wa nabêje û naxwaze lê partiyên ku bi navê Kurd û Kurdistan, hatine damezrandin vî karê nebaş bi navê gelê Kurd dimeşînin. Heger wa herê wê roja sibe piçek otonomiyek li Iraqê û belkî jî yek wilo li Turkiyê bê avakirin, heger li herêma bakurê Kurdistana îro di nava sînorê dewleta Turkê Kurd wek millet bimînin! Bi vî koçkirina îro û bi vî malwêranbûna îro li vî he-rê-mê wê çend salên din tu kes bi navê Kurd li naminin. Ji xwe ziman îro bûye Turkî û asîmîlasyon jî sedî pênç bihuriye.

Di dawî de hêviya min ji gelê Kurd û berî herkesî ji kesên endamê partiyên Kurdan ew e ku şiyar bin û koledarî ji hinek kesên re nekin, berî her tiştî serxwebûna xwe bi xwe bidest bixin. Heger endamê partiyekê yan jî welatêkî bi xwe ne serbixwe bin wê partî û welatên wan tu car serxwebûnê nebînin. Bêguman partiyên Kurd yê baş û çak jî hene û wê endamên şahreza û serbixwe jî her tim hebin û hene jî. Hêviya me jî ji xwe ew kes û partî ne.

Divê em dev ji ezîti û partîtiyê berdin

●Fehîm Botanî

Bi min sedemên şerê nav xwe yê di nava hêzên Kurdan de bi gelek hoyan ve tîne girêdanê. Ji wan: Em berjewendiyê xwe di ser partîtiya xwe re digrin, ya partîtiya xwe di ser miletê xwe re digrin û ji ber vî yekê jî, em hevalên xwe fêrî perwerdekirina dijîti û kuştina hev dikin. Di baweriyê min de, şerê xwekujiyê ku di navbera Partîya Demokrat a Kurdistanê û Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê de jî hêlekê ve û yê PKK'ê û Dewleta Federe jî hêleke din ve çêbûn, yê wê zihniyetê bûn. Ma gelo ev şer bi xwe ne tîrsek bû, ku kete zikê 30 mîlyon Kurdî?

Belê, tîrsa vemirandina wê çirûska nû veketî, di dilê her miletperwe Kurd de tîrseke bêsinor bû. Û jî ber vî jî, ez nikarim xwe bigihînin wê baweriyê ku siyasîetkirina bi vî rengî wê bikaribe. Seyda: a dema îro bide û qezenceke bi rûmet ji bo pêkanîna armancên gel bi dest bixe.

Bi min li gora mercên dema îro, ji bo parastina destkeftiyên gelê Kurd divê em dev ji ezîti û partîtiyê berdin û berjewendiyên gelê Kurd ji xwe re bikin armanc. Yan na ne ew kesên ezîti dikin ne jî ew partiyên ku partîtiyê dikin dê li qadê naminin. Ma emê cardin ve fersenda ku bi dehan salan e em çavnehêrî wê ne, wînda bikin?.

Dûmahîka nivîsan

Çiroka Kurdî ya gelêrî...

goyê nabin, ji me re dide xuyakirin. Bûyerên wê (yên mîto- loja) wek ku dibêje gerek qewimî bin, lewra Maykil Kraft wê bi "hevçeşnê dîrokê" dinavîne. Ango ne dîroka ku bi rastî qewimiye, lê ya ji xelkê weye ku qewimiye. Dastan jî pêdiviyî van rêçan e, lê çiroka gelêrî ne wisa ye, bêhtir erkeke perwerdane û idyolojîyane bikartîne, digel erka wê ya dîrok- kirin û rola wê ya bînfîrehkirinê. Li tenîştê wê gencîneya ku di nava xwe de bi cih dike, em dibînin ku ezmûne û serboriya netewî ya hemû qonaxên cihê cihê yê demê ji xwe re dike hêz. Çinkî di wan qonaxan de alavên çandeyî û ragihandinê wek roja îro tune bûn. Ligel van cihêwaziyan jî, em dibînin ku keleşor van hemû babetan bi hevdû ve girê dide. Mîtojojî û destan û çiroka gelêrî tev di çarçewa keleşora lîvîkî de bi cih dibin, ku li seranserî serdeman nîfşekî sipariyê nîfşê dîtirê; wê gavê bêjeya bilêvkirî desthilatdarî dikir. Renge diyardeya dîbarekirina gelek hevok û movikan di navbera mîtojojîyê û destan û stiranên qehremaniyê û di çirokên gelêrî de, ji ber vî tî, reng e ew bi xwe çesipandina metiriyala lîvîkî be, çinkî ew hevok û movikên wek- hev, wek xalên xwesipartinê, di- hatin danîn daku giringiya bûyerê berzîr bibe û bala mirovan bêhtir bikîşîne ser xwe.

Eger em herin ser çiroka gelêrî ya Kurdî û em hewl bidin li sedem û egerên derçûna wê bipirsîn; nîrx û bihayên ku pêşkêşîyê, dîmenên wê yê gîştî. Emê bî- bînin ku ev çîrok ji qonaxa koçerî hatiye û ji ya derebegî ku hê şûn- şopa wê, li gelek herêmên Kur- distanê, bi awayên renga renga peyda dibe.

Çiroka Kurdî ya gelêrî, qehre- maniyê, merdbûn û dilsozî û dest- pakîyê berz dike, giranbûna dike. Şîret û pend û evîna ku ne her gav bêyî pêwendiyên seksî ye, payedar û nîrxdar dike. Di heman wextê de li ser pîrevok û cinan di- peyive, cihêbûnê dixê nav çakî û zîyanê renga ev cihêbûn bi xwe ji

Îslamê hatibe, lê bi gîştî bandora Îslamê li ser çiroka Kurdî ya ge- lîrî, kême. Şexsê mirovê dîndar pir di çîrokê de xuyani nabe. Eger xuyani jî bû dê li qiraxê, ne di movikên bîngêhên yê çîrokê de be. Lê nav, piraniya wan Îslamî-Erebî ne. Ez bawer im ku ev jî di pêvajoya xwe ya dîrokî- civakî de tiştekî normal e.

Armanç: *Lê bîrûbawerîya bi qederê, di çîrokên gelêrî de, nade xuyani kirin ku bandora Îslamê bandoreke giran bû?*

E. Seyda: Na. Li vir, ez dik- arim olên kevnar yê ku Kurdan ew diparastin, wek nimûne bidim nîşan kirin. Ewan olan jî bîr û bawerîya bi qederê giring didîtin, li gor nêrîna wan, qeder, viyana xwedanan bû. Ango ramana qe- derê taybetmendiyê hevbeş e, di navbera hemû olên esmanî û yê zeminî de, ne hema taybetmen- diyêke Îslamî ye.

Ligel vî jî, di dîmenên çiroka Kurdî ya gelêrî de, daxwaziyên pêkanîna li hevhatin û di civakê de parastina terazûnê, tîn xu- anîkirin. Reng e ev daxwazî bi xwe, ji kakila civata Kurdî tîn pê, çinkî, civaka Kurd (wek komel), di wê qonaxê de ya ku çiroka gelêrî ji dayik bûye, li ser piyên koçer û cotkaran ava dibû û jî rexekî din ve, li ser piyên serokên êlan, xwedanên pez û girgîrên xwedî erd û zevî. Pira- niya caran, xwedanê erd û zevî- yan bi xwe serokê êlê bû jî. Lewra cotkarên ku di zevîyan de dixê- itîn, di heman wext de, hest diki- rin ku xwedanê erd, xizm û meri- vêd wa ye. İca li dijî wî rane- dibûn, anga pevçûneke şerâmêz di navbera wan de yan jî li dijî xwedanê erd rûnedida. Lê dil- mayîneke veşartî bi awayê ga- zînan, giliyan û arezûya çak- kirina rewşa aborî car caran diyar dibû. Xwedanê erd jî nikarîbû dev ji wan cotkaran berde -yên ku xizm û meriv in- çinkî bi nisbetî wî, beramberî êl û eşîrên dîtir, hêz û şiyar û samana wî ne.

Lewra çiroka Kurdî, ya ku rewşa wê qonaxê wek naverok di

xwe de bi cih dike, dawîya dawî bi lihevhatinê kuta dibe: Lawê pîrê, pîra perîşan ê ku piraniya caran bi navê "Mihemed" têt nasîn, dikare li dijî gelek tiştan xebatê bike, biêşe, şerpeze û ser- gerdan bibe, lê di dawiyê de, ê AXA lê dibuhure û rê jê re vedike daku ji nû ve li bin baskê êlê bi- hêwire.

Kurê Axê dil dikeve keça yê perîşan û feqîr, lê dighêjin hevdu û xweşî li êlê belav dibe; her wisa kurê yê feqîr dikare dil tê- keve keça Axê".

Kêman em raserî çîrokêkê tîn ku pêwîstiya rizgarbûna gîştî ya hêzeke civakî li beramberî hê- zeke dîtir, dixwaze.

Ma ku em wan çîrokên Kurdî yê ku li ser qehremaniya netewî dipeyivin; li ser perzîkirina gelê Kurd û bîrûmetkirina dagîrkeran, bidin nîşankirin. Ev çîrokana her- gav bi şîweyêkî tirajedî kuta di- bin, çinkî ji tîkçûn û şîkestina serîhildan û şoreşên Kurdî der- diçin. Ev çîrokana nêzîkî romana devîkî ya dîrokî ne, lê çî kême çî zêde, ji çavkaniya xwe bi dûr- ketine, ew jî, ji ber wan lîzêde- kirinên ku xeyala gelêrî bikara- niye.

Pêwîst e bê gotin ku xebata gelek kesên lîkolînger, di vî warî de, gerek bê pesinkirin, ku di wa- rê berhevkerin û tomarkirina çî- rok û serpehatî û sitiranên gelêrî de, karekî giranbûha kirine.

Lê ta nuha me ji dil, berê xwe nedaye qonaxa duwemîn, mebesta min qonaxa rexnelêgirtin û nîrx- andin û li ser rawestanê, çinkî di vî qonaxê de emê bikaribin dîme- nênan awira civata Kurd li beram- berî jîyanê têbigihêjin, emê psî- kolojîya gelê Kurd ya civakî bi- nasin; sewiyeta geşbûna wî ya aborî, awayên raman û tîramandi- na wî jî.

Ji xwe pêwîst nake ku ez bi- dim xuyani kirin, ku ew tiştana tev dikarin ji dastan û efsanan, ji çîrok û stiran û ji gotinên pêşi- yan, ji pêkenî û mamikan bê derxistin.

Yaşar Kemal

lanetkîrî derbasî sedsala 21'ê nebe. Ji bo rawestandina vî şerrî, dê wîdanê mirovatiyê li ba gelên Turkiyeyê be. Nemaze divê gelên wan welatên ku çekan didin Tir- kiyeyê, vîya pêk bînin. Em kes- ên ku li Turkiyeyê dijîn divê ji bîr nekin ku rêya demokrasîyê di çareserkirina pîrsa Kurd re derbas dibe.

Ji damezrandinê û heta nuha- tev ku di demên dawiyê de ev ta' de hebekî kême jî bûye- hewil- danên damezrênerên Komarê yê jî bo ji ortêrakerîna ziman û kul- tûra Kurdan, li dijî mirovatiyê cînayetek e. Mirovatî dê di sedsa- la 21'em de succaran yek bi yek derxîne ortê û mehkeme bike. Ev ê ne mehkemeyeke normal be. Ji ber ku ya ku di van daweyan de bête mehkemekirin, dê heysiyeta welatêkî be..."

Nivîsa Y. Kemal tesîreke weha kir ku hemû dezgehên dewletê, ji bo êrişan û wergirtina tedbîrên ji bo dengbîrîne, bi hevdû re qayî- şê dikîşînin. Êdî pirtûkên ku meq-

alayên Yaşar Kemal jî tî de nin, di bin hedefa xezeba dewletê. Li Stenbolê, Dadgeha Ewleyî ya Dewletê pirtûka ku du meqaleyên Yaşar Kemal jî te de bûn, qedexe kir û ji bo berhevkerina wê, bi- ryar da. Navê vî pirtûkê; "Azadiya Fikrê û Turkiye" ye. Piştî dawewekirinê, gellek nivîs- kar, hunermend û rojnamevan li hevdû civîyan û bangek bi navê, "hewildana li dijî sîcê fik- rê" derxistin. Di vî bangê de weha tîte gotin; "Piştî Voltaire bi 200 salan, em ê hem nîşanî xwe û hem jî nîşanî dinyayê bi- din ku em ji wî ne paşdetir in. Em bawer dikin ku em ê vî le- keya ku di eniya civaka me de ha- tiye dayin, ji ortê rakin."

Xuya ye, qîrîna Yaşar Kemal li Turkiyeyê gellek nivîskar, roj- namevan û hunermend rakirin ser piyan. Ev jî ji bo piştgiriya doza gelê Kurd îmkan û moraleke mezin e.

Mustafa Aydoğan

Behr şîn e, av tê nîne

Keder

Peyvek Rûsî heye dibêje "Wek kivarkên piştî baranê" Yanî piştî ku baran dibare, kivark pir dibin. Mebesta vê peyvê eve ku ji nişkê ve xelk an jî tişt li cîkî zêda û gelek kom dibin. Ev peyva han hat bîra min piştî min dît û nedît ji nişkave, li Rûsyayê, wek kivarkên piştî baranê, kivarkên navendên çandî yên Kurdî pir û zêde bûn.

Berî her tiştî, ez gazî xwendevan dikim û dibêjim:

"Xwendevanîno, win jî navendên xwe ava bikin çimkî pir hêsane û serêşî jê re navê, ji ber ku çî kesê malek an xanîkî kirê bike, roja din telefonê ji heval û dostên xwe re bike û bibêje: Vaye min navendê çandî damezirandîye werin em xebatê bi hev re bikin! Piştî demeke kin, li Rûsyayê, hijmarek bi gelek caran zêdetirî hejmara navendên çandî yên Kurdî li Ewrûpayê, hatin avakirin. Navên van navendan yek ji yê din xweşik û sipehîtir e. Heger win bawer nekin werin em bixînin. Ew ji navendan re nabêjin navend, tenê nişan dikin bi çî karê dirabe: Bêzarê Bazirgan navê navenda xwe bi vî rengî kifşîkirî ye: "Çand û Kultur" (bi kurtehi: ÇÛK). Basiqê Fileh ev nav li navenda xwe kiriye: "Qelem û Nerxgerî" (QÛN). Nehtoro jî navê navenda xwe bi rengî nişan dike: "Zanist, îlm û kultur" (ZIK) Yê herî diltenik û dilovan navenda wî bi vî karî dirabe: "Huner û Beşên Kulturî" (HÊK).

Piştî we navê navenda xwend, werin em bibînin xwediyên wan çî ji hev re dibêjin gava bi telefonê bi hev re dipeyvin. Bêzarê Bazirgan ji Basiqê Fileh re dibêje: Qûna te çawa ye? Basiqo jî vedigerîne: Qûna min baş e, hele ez dibînim Çûkê te baş nafirîn, tu dibê çeng bi wan ve nînin? Dilteniko ji Nehtoro re dibêje: Zikê te inşallah nema diêşe? Nehtoro dibêje: Zik bi min ve nemaye, lê min bihîst hêkên te hemî şikestin? Dilteniko vedigerîne:


Erê çend hêk şikestin, lê hîn gelek li ba min hene.

Kar û xebata wan, ji sibehê heya êvarê eve ku li hev du dipirsin û tu kar û xebatê nakin. Ji ber vî tiştî ez naxwazim qala van serokan bikim, lê serpêhatiyek Kurdan heye dibêje: "Dinya bi tiran be, wê hemî behra keran be". Bila wisa be. Kesî bawer nedikir ku ev navend bi serkevin. Nav û deng bi ser serokên wan ket û ev serok bûn qubla-name hemî Kurdan.

Berê min digot: "Feyda gavanan siwarbûna keran e" Lê piştî ku ev navend bi kar û bazerganiya xwe bi ser ketin, min jî xwest ez tiştêkî bikim ku qezencek bigiyê min jî. Çend rojan min mejiyê xwe guvêşt, dawî min biryar stand ez wezaretekê bi navê karbarên çandî di xaniyê xwe de ava bikim û min navek wisa jê re guhest: "Karê Îlmî û Rewşenbîrî". Ez bi kurtehi navê wezaretê nabêjim, ji ber ku ditirsim, win jî wezaretên xwe ava bikin û vî navî ji xwe re bistînin. Roja din min telefon kir ji serokên navendan re û min got: Gelfî serokan, gerek win ÇÛK, ZIK, HÊK û QÛN ên xwe li Wezaretê Karê Îlmî û Rewşenbîrî qeyd û tescîl bikin. Welleh-tileh yên ku navenda xwe qeyd neke ez destûrê nadim ku bi kar û bazirganiya xwe rabe.

Ez serê we naêşnim, roja din çend wezaretên çandî li paytexta Rûsyayê hatin damezrandin û ez şerm dikim navên wan binivîsînim, ji ber ku wan navek wek navê wezaretê min ji xwe re bijartin. Lê yek hebû xaniyê wî gelek fireh bû 4 odên wî hebûn, navê wezaretê xwe bi vî rengî nişan dan dide: "Wezaretê Fen û Fûtan" Ev wezaret ji hemî wezaretan çêtir bi kar û bazirganiya xwe dirabe. Ji ber vî tiştî min wezaretê xwe tevî vî wezaretê kir. Anha roja îro, halê min gelekî xweş e. Hevalên min gelek hesûd in. Yekî ji wan ji min re got: "Aşê nezana bi xwe digere" Tu ji min re nabêjî çima? Min jî got: Ne hewce ye tu hesûdiyê bikî, ji ber ku "behr şîne û av tê nîne".

**Em têkoşer
û mêrxasê
gelê Kurd
û partiya me
NECMETTİN
BUYUKKAYA
di salvegera
11'em a
şehîdetina
wî de
bi bîr tînin.**



Necmettin Buyukkaya
1943-1984

YEKBÛN
Komîteya Ewrûpayê

BEROŞ



Mahmûd Lewendî

Jibo xwendevanên ne helbestvan û poêt û lirîkvan

Ev demeke dîr û dirêj e ku ez helbestan dixwînim. Ez hatim nuxteyek wêlê ku êdî bi xwendina helbestê ez têr bûm. Êdî mejiyê min xwendina helbestê qebûl nedikir. Min jî der û dora xwe pirsî, tu kesî nikarîbî bersivêk bida min. Min jî xanimê pirsî, got: "here duxtor". Min jî bi a. wê kir. Ez çûm ser duxtorêkî. Duxtor pêşî guhdariya min kir, paşê guhdariya laşê min kir û ez şandim rontgenê. Filimê mejiyê min kişandin. Min filim nîsanî duxtor da. Duxtor got "mejiyê te tiştî bûye helbest, divê ku em ya bi emeliyatekê nivê wan helbestan ji mejiyê te derxin, daku mejiyê te bikaribe dîsa wekî berê bixebite, an jî divê ku tu bi awayekî din bikarîbî mejiyê xwe vala bikî, yan na temenê jiyana şaneyên mejiyê te hindik maye, mejiyê te li ber sekratê ye."

Ya rabbî, ez çî bikim, çî nekim? Ez jî emeliyatê ditirsim. Li pêşîya min he jiyaneke dîr û dirêj heye, bebika min jî he şes mehi ye. Icar hema qet nebe ji bo xatirê bebikê be jî divê ku ez mejiyê xwe xelas kim, yanê piçêkî vala kim daku di rojên pêş de bikarîbim bi mejiyêkê paqij û niv-vala kevnêçîrok û çirvanokan ji bebika xwe re bibêjim. An jî bi kêmanî jê re qala bebikiya wê bikim. Lê çawa bikim? Ezê çito ji wan helbestên ku

mejiyê min îşxalkirine xelas bim?

Axirkê, ez serê we neêşnim, min gelekî li ber xwe da. Ziyaret û şex û mele neman min serî lê nexist. Ji xwe serê min jî kûpyaye.

Wele dawîya dawî Xwedê li min hat rehme û Xocê Xizir şand hewara min.

Belê seveke jî sevekan kanûna paşî, ez ne şaş bim saet duduyê nivê seve bû, ez bi helekel û jî xuydanê piceme û fanolye şibûyî ji xew şiyar bûm. Bi vî şiyarbûna min a bê wext re, xanim û bebika me ya şes mehi jî şiyar bûn.

Xanim bi cavên niv-xewî û mejiyekî tişepirs û bebika feqîr jî bi niv kelogirî lê bi memika naylonî ya di dêv de li min dinêrin. Zimanê bebikê nagere lê diya wê Xwedê jê razî be, pirsî:

-Çi bû, çî bi te hat, ev çî xuydan e?

-Qet nepirse jinê, min xewn dît!

-Ya xêrê be, te çî dît?

-Xocê Xizir!

-Çiîîî? Xocê Xizir!

-Êrê welleh, min Xocê Xizir di xewna xwe de dît!

-Êêêê?

-Wele min Xocê Xizir dît û jî min re çareya nexweşîya mejiyê min jî got!

-Êêêê! Çî got, çî got?

-Got "divê ku tu helbestan binivîsî"

(Xwendevanên heja dawîya vî çiroka jorin ezê paşê ji we re bibêjim, lê ezê nuha bi gotina Xocê Xizir bikim, çimkî helbestnivîsandina min hatiye divê ku ez bikim. Belê, aha ji we re du helbestên pir xweşik û gilover. Eger we begem kir ji kerema xwe re jî min re binivîsîna daku ez êdî di vî bareyê de binivîsim.)

NUXTE NUXTE YA MIN !!!

Ey buhara ber dilê min
Rojê min, hîva min, stêrka min
Tu yî, tu yî ronîya lamba min
Axx, ku elektrîkê qut nekin ji ser min!

Gula min, guldanka min
Di guldankê de ava min
Di avê de masîya min

Were xwe dirêj ke li bin siya min
Eger bi me bihese bav û birayên te
û dijminê min

Emê bi çepelê hev bigrin xwe bavên bin
kevne-çadira xalê min!

Xalê min î mêrxas e
Ber tena derpê û kiras e

SEBIR

Sebir, sebir, sebir

Bi sebrê

Mirov digihîje qebrê.

Qebir kûr e

Kêmbere, hûr e

Tijî mar û mûr e

Û ji mala me pir dîr e

Ji holê rabûye dewra meralî û şûr e

Êdî ciyê wan girtine qelem û tembûre

Ting û ring, lîr û lîr û zûre-zûr e

Ting û ringa min jî dil tê

Ew ji ber zikê birçî tê

Û ava çema bi xuşîn tê

Derya şîn e, av tê nîne

Ji min re nan û helawê bîne!

Exbarek ji Kak Mistefa û Mam Hemîd bo Beroşê Birka avjeniyê

Kurdekî Swêdê îsal bi saya laşê xwe û awayê bikaranîna avê, ji birka avjeniyê sed hezar Kronên Swêdî qezenc kir. Ev jî bo hemû Kurdên laşgirs, bû tecrûbeyeke nuh û rêyêke pereqezenckirinê. Vî tiştî bala Swêdiyan jî kişand. Em dizanin, xwendevanên ku ji xizmeta rewşenbîriyê bêtir, çavên wan li qezenckirina pereyan in, meraq dikin, bê ev çî rê ye.

Gellek rehet e. Eger birkek avjeniyê bi dest we ket û laşê we jî hinekî girs be, an jî ger hun bikarîbin yekî laşgirs peyde bikin, wê gavê we li bilûrê xist. Birka xwe ya avjeniyê nivê av bikin, eger laşê we girs be hûn bi xwe an na karkerên xwe yê laşgirs têxin nav birka avê, hûn ê bibînin ku birka we ya avê mişt bû. Havînî pê de, yan jî sal duwanzdeh meh, ger hûn wiha bikin, bi tenê ji ava kêr, di salekê de bi kêmanî sedhezar kronên Swêdî di bîrika we de dimîne. Qezenca we, ne ev bi tenê ye. Hinekî hişê xwe bidin serê xwe û binêrin bê jî çend aliyên din de hûn fede dikin; Êdî ne pêwîst e hûn ji bo xelaskirina zarokan yan mezinên bi avjeniyê nizanin, karkerekî bigrin û mesrefa zêde li xwe bikin bar. Gava we dît,

merivek dike bifetise, ne lazim e hûn têkevin tev. Wê gavê ger mirovê me yê laşgirs kû ser nêviyê avê temam dike, ji birkê derkeve, ji xwe av dadikeve nêvî û şertê fetisandinê jî ji ortê radibe. Swêdî birka ku di destê vî Kurdî de ye, ji bo avjeniyê ewletir dibînin û ji bo zarok û delaliyên xwe bibin vî birkê, ji çend rojan berê de û bi xatir û wasite, bilêtan peyde dikin. Ev jî dibe sebebê ku pere di bîrikan de hîneyên.

We rûyê pereyan dît û hûn dikenin, ne? Bikenin, bikenin! Pere şêrin in...

Ma hew ev bi tenê ye? Nuha li Swêdê gellek plangerên ji bo di birkan de kêr bikaranîna avê, li ser vî metoda Kurdê me serê xwe gellekî diêşînin. Di vî warî de civîn li dû civînan, panel li dû panelan pêk tê û rojnemeyên rojane, hefteyî û hwd li ser vî metodê dinivîsînin. Va, hun bi ser zimanan jî dikevin! Welleh gellek baş e. Hem bîrika we tişepere dibe û hem jî navê we derdikeve. Ma hun hûn çî dixwazin?

Ji bo vî, ger hun bi tenê di xwe re bibînin û telefonî 909 000 999 an jî 999 000 909-an bikin, hun ê E. Seyda: a kamil werbigrin.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Xewna Lîcoln -Serekomarê ku xwe di xewna xwe de dîtibû-

Kesên ku dibêjin xewna rastîn dîtine pîrî caran bi avakî ciddî nayên qebûl-kirinê. Abraham Lîcoln (Serokomarê DYA 1861- 1865) dema di sala 1865'an de ji dostên xwe re behsa alameta xewna xwe kir kes jî bawer nekin. Lîcoln xewna xwe ji dostekî xwe jî nêz, Ward Hill Lamon re behs kir. W. H. Lamon gotinên Lîcoln nivîsand:

"Nêzî deh roj berê, derengê şevê min xwe dirêj kir. Piştî demek kurt xewna min dest pê kir. Te digot qey bédengiya miriya li dora min hakim bû. Weke ku pîr kes digrin deng dihatin guhin min. Min xewna

xwe de dît ku ez ji nivîna xwe rabûm û çûme qata jêr.

Li qata jêr bédengî bi dengên giriyê xira bû lê kesên di şîne de bûn nedihatîn dîtîne. Ez jî odekê çûme odeke din. Min tu kes nedît lê dengê şîne tim di pey min de bû... Ez şaş û bi xem bûm... lê min biryara xwe dabû ku sebebe ev rewşa mîstîk û dila dipêrtîne dertî holê.

Min gera xwe domand heya ku hatim Oda Rohhilatê ku li wê derê laqayî surprîzeke ne xweş bûm. Li pêş min katafalkek (ciyê ku tabûtê datînin ser) hebu û yekî kefenkirî di nav tabûtê de bû. Li dora katefalkê notirvanên şerefê û kesên di şîne de - hin ji wan digiriyan, hin jî pîr xemgîn bûn - hebûn û li yê mirî bi awakî xemgînî dinihêrtin.

"Li Xaniyê Spî (White House) kî miriyê?" min jî eskerekî pirsî. WîE. Seyda: da, "Serekomar. Ew jî alî qatîlekî bêşeref hatiye kuştin." Ji roja ku A. Lîcoln behsa xewna xwe kir pênc roj derbas bûn û Lîcoln li Ford's teacher Theater li Waşingtonê jî alî John Wilkes Bootli ve hat kuştin. Laşê Lîcoln birin Xaniyê Spî û ji bo merasimê li Oda Rohhilatê bi cih kirin.